


OROJA NÛ

kovara huneri çandi û edebi



33
1992

NAVEROK

| | |
|---|----|
| Helbest- "Gelek sal in"- Riza Colpan..... | 3 |
| Raporeka Dewleta Tirk: "Serhildan Tevgereke Milli ye" - Baran | 4 |
| Helbest- "Jinêñ Kurd"- Vazgal | 9 |
| Destana Zembilfiroş - A. Gernas | 10 |
| Gotinêñ pêşîyan - Berevkar: Salih Omeri | 15 |
| Jinêñ Kurd Esil in- Thomas BOIS | 16 |
| Radyo-dramatika "Mem û Zin" - Robert Alfton | 23 |
| Stranêñ Serhildana Agiri - A. Bazidi | 26 |
| Quncikê Zarokan | 28 |
| Jî zargotina me: Deranin - B. ZINAR | 30 |
| Berevoka Terman: Navê gul û kulikian | 31 |

Sal: 13

Hejmar: 76, Adar 1992

ISSN 0283-5355

KWEDI: KOMKAR-Swêd

BERPIRSIYAR: Şêroyê BOTAN

NAVNİŞAN: Gustavslundsv.168,1 tr
161 36 STOCKHOLM

TELEFON : 08/ 26 23 75

HESAP NO: PG. 458980 - 0

UTGIVARE: Svensk Kurdiska

Arbetarföreningen

ANSVARIG UTGIVARE: S. BOTAN

ADRESS: Gustavslundv. 168, 1 tr.

161 36 STOCKHOLM

FAX: 08/ 25 38 57

Jî xwendevanê ra

NEWROZ PİROZ BE!

Xwendevanê hêja, em Newroza we û hemû gelê me piroz dikin û hêvidar ìn ku sala nû ji gelê Kurdistanê ra bibe sala serkevtin û azadiyê.

Roja Nû

"GELEK SAL IN"

NEWROZ lı nav xwina sor de
Piroz dibe, gelek sal ìn
Derbederi lı ser me de
Qet kêm nabın hezar sal ìn

Dijmin ne yek, çar dewlet ìn
Sê nijad ìn, sê milet ìn
Har ìn, hov ìn, bê rûmet ìn
Xwin vedixwîn hezar sal ìn

Nahêlin em cejna xwe
Piroz bikin gor dîlên xwe
Bibin xudan heq, mafêñ xwe
Dibin asteng hezar sal ìn

Ew têñ gel hev bo pîrsa me
Dirîjinin ew xwina me
Dîşelinin welatê me
Ev bêbexti hezar sal ìn

Helbet dijmîn, tîm tijmîn e
Gelo sûcê me qet tune?
Çira hêz lı dîj hevdu ne?
Ev dîjberi hezar sal ìn

Bî rasti ev şerma me ye
Sûcê min e, sûcê te ye
Ev rewş gel ra zehf gunye
Bîndest dijin hezar sal ìn

Bes êdi, usa nabe
Hêz bibin yek, ku gel şabe
NEWROZ lı Kurd her piroz be
Rîza xemgin gelek sal ìn.

Riza COLPAN

25-2-1992, Sydney

*Piştî Şorişa Şêx Said
Raporeke Tîrkan
Di Derheqa Serhildanê û Rewşa Kurdistanê da*

"SERHILDAN TEVGEREKE MİLLÎ YE"

Werger:BARAN

Ev rapora jêrin, piştî şorişa Şêx Said, bî daxwaza Serokwezir İsmet Paşa bî destê Mebûsê Çankırı (ew her usa ji serokê meclisê bû) Abdulhalik Renda hatiye hazirkirin û di meha Ilona sala 1925 da daye İsmet Paşa. Ev raporeke vesarti ye, heya nuha ne hatiye eşkerekirin û qasi ku em dizanin, li tu deran ne hatiye weşandin.

Rapor bî gelek awayi muhim e. Beri hertiştî ew, wek raporeke resmi, di derheqa serhildana Şêx Said da, her usa ji, bî awayeki giştî di derheqa Kurdan û pîrsa Kurdi da raya dewleta Türk eşkere dike.

Dewleta Türk ji roja serhildana Şêx Said heya iro, ji derva got ku serhildana Şêx Said tenê tevgereke dini ye, kevnepresti ye, ne tevgereke millî ye. Helbet, ew ne raya esli bû, tenê propagande bû. Em zanîn ku hakimên wan usa ne gotin. Hakiman ji Şêx Said û hevalên wi ra gotin ku "we din ji xwe ra kir mane û we bî rasti xwest Kurdistanê serbixwe ava bikin. "Rasti di vê gotinê da bû. Rapor Abdulhalik Renda ji vê rastiyê eşkere dike. Dibêje ku, "Serhildan di bin perdeyeke dini da tevgereke millî ye."

Raya dewleta Türk ya rasti ev e, ji ber ku ev rapor bo propagandê nine, ne ji bo derva ye; bî destê mebûseki Türk û ji bo serokwezir hatiye hazirkirin. Xudiyê raporê helbet raya xwe ya rasti çi ye wê dibêje.

Ya duwemin, rapor di derheqa milletê Kurd

da raya dewleta Türk eşkere dike. Dewleta Türk heya iro hebûna Kurdan inkar dikir, digot "Kurd ne milletek in, zmanê wan ê taybeti, di-roka wan tune", digot "ew Türkên Çiyayı ne." Lê di yê raporê da usa nayê gotin. Rapor eşkere dibêje Kurd û Türk du milletên cuda ne, zmanê Kurdan cuda ye. Ü mesûlê Türk çi di dilê xwe da ye eşkere dike. Dibêje "du millet li ser vê erdê nikarin bi hevra hukim bikin, divê yek ji ortê hulbê!" Weki gotina Kurdan: Qoçê du beranan di beroşkê da nakele.. Ew Kurdan wek dijmin dibine û ji ortê rakırına wan digere.

Agahdariyeye muhim ku di raporê da hatiye tesbit kîrin, di derheqa nifûsa Kurdan da ye li Kurdistanê û Rojavayê. Helbet dilê Abdulhalik Renda, di raporeke hani vesarti da ji naxwaze rastiyê bî tevayı bêje. Hin tiştan vedişêre, xelkê bajarê Kurdistanê wek Türk nişan dide û dibêje "Türk in, lê Kurdi hin bûne, Kurdi zora wan buriye!" Lê disa ji, Renda bî devê xwe dibêje ku, li Rojhilata Feratê hejmara Tîrkan qasi pêncan da yekê Kurdan tune. Heya gor gotina wi, ji 1.365.000 nifûs, yêñ ku Kurdi xeber nadîn, qasi 100.000 in. Ango, ji vê ji xuyaye ku, wê demê hejmara Tîrkan li Kurdistanê 13 da yek ji nine.

Ango, ev rapor, wesiqeke gelek hêja ye bo Kurdan ku gelek tiştan eşkere dike, derew û propagandê dewleta Türk pûç dike. Kurd dikarin di eşkerekirina rastiyê û di rûreskirina

dewleta Tirk da ji vê raporê istifade bikin.

Tışteki muhim ji pêşneyarên wi ne, bona "safikirina" pirsâ Kurdan. Anglo cezakirina Kurdan; ciwarkirina Tîrkan di Kurdistanê da û avakirina gund û bajarêni Tîrkan yên nû; nefikirina Kurdan; vekirina mekteban bo hinkirina zmanê Tîrki; qedexekirina zmanê Kurdi û hwd.. Mebûsê tîrki bo vê yekê hezar fend û xirabi fikir dike.

Usa xuyaye ku, tesira vê raporê li ser hukumeta Tîrki ji gelek xurt dibe. Hukumeta Tîrki di 8'ê Ilonê, 1925 da buryareki distine û encumeneki (komisyon) saz dike ku li rewşa Kurdistanê hûr binêre, li tevdiran bigere û plan û programekê hazır bike. Ew encumen di bin serokatiya Wezirê Hunduri Cemil da, bi Serokê duwemin yê Erkanê Herbiyê yê Gîsti Kazim Paşa (Karabekir), Wezirê Dadi Mahmut Esat û Abdulhalik Renda pêk hatiye. Di wê demê da Wezirê Hunduri Cemil ji derheqa serhildana Kurdan û rewşa Kurdistanê raporek hazır kiribû. Ew rapor tevlî ya Renda hawaleyi Encumenê dibe. Encumen li ser herdu raporan dixebite, bi esker û waliyên li Kurdistanê dide distine û raporeke nu çêdike dide hukumetê. Meriv wexta li vê rapora Encumenê dînihêre dibine ku pêşniyarên Renda, hema hema bi tevayî, tê da ci girtine. Hukumet gor rapora Encumenê, bi navê Sark Islahat Planı (Plana Islahatê li Kurdistanê) bernamekê datine pêş xwe û êdi siyaseta dewleta Tîrki bi salan di vê rîçê da dimese, heya iro tê.

Rapora Wezirê Hunduri bi hun aliya, ji ya Renda ji muhîmtur e. Wezir di pêşniyarên xwe da dubêje ku, "Emê li Rojhîlatê walitiya Gîsti saz bikin û wê derê wek mistemleke idare bikin." Rasti ji ev e. Hukumeta Tîrki bi salan e Kurdistanê wek mistemleke idare dike. Heya di hun aliyan da rewşa Kurdistanê ji mistemlekeyan xirabtir e ji.

Piştî vê raporê dor bê û emê rapora Wezirê Hunduri Cemil beyefendi (Cemil Uybadin) û ya Encumenê ji biweşinin. Ev rapor siyaseta dewleta Tîrki ya qirêj û xwinxwar gelek baş eskere dîkin.

Notên binê raporê û yên nav parantêzan ji ali me hatine danin.

Dî Derheqa Serhildana 1925 û Rewşa Kurdistanê Da

RAPORA ABDULHALİK RENDA (Serkê Meclisa Tîrkiyê)

Jî bo Serokwezirê Komara Tîrkiyê, Hezreti İsmet Paşa yê Berêz ra:

Jî ber emîr û fermaña we ya bîlind, ez çûm li mintiqâ serhildanê û li wilayetên der û dorê wê gerim. Çûm li wilayetên Entabê, Ruhayê, Sorekê, Diyarbekrê, Sêrtê, Bitlisê, Wanê, Mûşê, Darahênen (Genç), Xarpitê (Elaziz). Dersimê, Erganiyê, Mêrdinê, Meletyê û Meraşê, li bakûr û başûrê qıraqê Gola Wanê, li qezayênu warê serhildanê bûn di navbera Mûş û Darahênen û Xarpitê da û li hemû qezayêni wilayeta Dêrsim, di başûrê meletyê da li qezayêni Kahta, Husnimansur û Bêşni, hemûyan gerim.

Dî lêgerina xwe da, beri her tiştî li ser vê yekê sekînim: Kurd li kêderê ciwar bûne, hejmara wan çiye, xelkê van mintiqan kijan zmani bi kar tinin? Min ev yek gor qeyd û qûyûdên resmi tesbit kîrin.

Ew wilayetên ku li Rojhîlata çemê Feratê û li başûrê çiyayê Bîngolê dîkevin, angô Ruha, Mêrdin, Sorek, Diyarbekir, Ergani, Xarpit, Dêrsim, Darahênen, Mûş, Bazit, Wan, Hekkari, Bitlis, Sêrt û ji qezayêni Erzurumê Hinis û Gêxi û yek ji qezayêni Erzinganê Hlemori, nifûsa van ciyan gor qeydên me yên resmi milyonek û sêsed û şêst hezar e.

Gor lêgerina me, li vê mintiqê piraniya chali (xelk), angô 993.000 kes Kurd e.

Dî nav vê nifûsê da hejmara Tîrkan ancax 250.000 e û yên ku Erebi xeber dîdin 117.000 kes e. Mêrîn Tîrki, qasi sedi da 80 Kurdi xeber dîdin. Nifûsa ku ne hatiye nivisin (bê qeyd) di van hejmara da xuya nake. Eger meriv hisêbê wan ji bike, hingê rewş ji bo bajariyan xirabtir dibe û ji bo Kurdan gelek çêtür dibe.

Dî vê mintiqê da, bajarê Birecikê û çend gunûn wi, bajarê Ruha, Diyarbekir, Bitlis, Exlat, Erdîş û li dora Erdîşê 11 gund, bajarêni Mûş, Palo, Mezra û ji heşt nehiyên Mezrê çar hew, bajar û qezayêni Xarpitê, navbendê qezaya Çarsıncaqê û du nehiyê wê, bajar û qezayê Çemişgezekê, Hozat ku navbendê Dêrsim e,

ew û gundeki wê û qezaya Owacîxê û şes gundêñ wê Türk in. (1)

Jı Tirkêñ `ku lı qezayêñ Çêmişgezek, Çarsincaq, Xarpit û lı çar nehiyên Mezrê dijin. ji wan pêve, lı bajarêñ din hemû mêtren Türk bı Kurdi xeber didin û dan û standina xwe bı Kurdan ra bı Kurdi pêk tinin. Bajarê Sêrtê û 7 gundêñ dorê, Mêrdin û 14 gundêñ wê, Midyat û 20 gundêñ wê, Sabûr û 14 gundêñ wê herçiqas bı Erebi xeber didin ji, mêtren van deran ji xwe ji tesira mintiqê xilas nakın û hemûyên wan mecbûr mane hin bin û Kurdi xeberdin.

Tesira mintiqê ewqas mezin e ku dı navbera Xarpit û Çêmişgezekê da lı hêla Ezat Gurmukxani pênc-şes gundê Tirkân heye û ehlê wan ji Türkî pêve zmaneki din nizanın, lê ji ber ku elewi ne, xwe Kurd dihesibinin.

Qezaya Haran lı Ruhayê û Nisêbin lı Mêrdinê tenê bı Erebi xeber didin.

Gor vê agahdariyê dı vê mintiqê da ku lı Rojhilata Feratê û lı başûrê çiyayêñ Bingolê dikeve, ji xelkê vê derê tenê 100.000 Kurdi nizane, hemû kesê din, yên ku Türkî û Erebi dizanın ew ji dı nav da, hemû bı Kurdi xeber didin. Lı wilayeta Meletyê ku lı rojavayê Feratê dikeve hejmara Kurdan ji nêvi piçek zêde ye û lı wilayeta Meraşê û qezaya Pazarcixê hejmara Kurdan, gor qeydên resmi 22.000 e. Jı van pêve. Lı wilayetên Entabê, lı Cebelibereket (Osmaniye), lı sêvasê, Yozgatê, Kırşehirê, Çorîmê, Aksarayê, Konyê û Enquerê û lı wilayetên Qers û Ertixanê hin nifûseki muhim heye ku Kurdiya xwe diparêze.

Kurdêñ rojhilata Feratê ji ali abori û zman va serketi ne, ango bı tevayı hukma wan derbaz dibe. Lı bajarêñ Tirkân wek Xarpit, Ergani, Diyarbekir, Ruha, Bitlis, Wan, Mûş û Paloyê, qismê mêtren bı dan û standina xwe bı Kurdan ra Kurdi xeber didin û bı vi awayi, ehlê gundan û bajarêñ biçük hemû karê xwe bı rêva dibin, bêyi ku mecbûr biminin û Türkî hin bin.

Lı rojavayê Feratê, rewşa wilayeta Meletyê ji usa ye. Dı vi wilayeti da tenê herçi mêtren Kurdan, ji bo rêvabırına karêñ xwe, mecbûr mane Kurdi hin bin (2). Lı wilayetên dinê ku lı rojavayê Feratê dikevin, herçi mêtren Kurd

herçiqas mecbûr mane Türkî hin bûne ji, jinêñ wan hin bı Kurdi xeber didin û hemû ji bı serhişki, tiştê ku berê ditine diparêzin û bı serbilindi dibêjin "em Kurd in."

Piştî ku dı rojhilat û rojavaya Feratê da netew û zman û hejmara xelkê xuya bû, êdi ez bême ser bir û baweriyêñ xwe ku piştî vê gera li mintiqê têghiştîme:

Serhildan dı bin perdeya din û kevnepereştiyê da tevgereke milli ye. Ew serhildanê teng û bı ser xwe, ku heya sala 330 (1914) çêbûn - serhildanê Bedirxaniyan- tenê lı mintiqeyeki xwe nişan dane û lı ser bingeha bir û baweriyêke milli ci negirtine, bona vê yekê ji nebûne tevgereke fireh ya Kurdistana mezin. Çawa serhildana 330 dı bin perda din da çêbû, lê bı rasti serhildaneke netewi bû, vê car ji bı tevayı usa ye. (3)

Gor serhildana 330, dı ya dawi da zêde mintiqe ci girtibû. Her çiqas, ev serhildan bı destê leşkerê me hat vemirandin ji, disa pêsi lı roj bı roj bîlîndbûna bir û baweriyêñ welatparêzi dı nav kurdan da nehate girtin. Kurd ji xwe, dı warê netewi da gelek serhişk bûn, piştî vê serhildanê serhişkiya xwe pêşva bûn (bir û baweriyêñ netewi dı nav wan da her çû xurttir bû). Bı nihîrinikeke tenik ji meriv dikare bibine ku raman (fikir) û çekêñ vê tevgerê gor ya 330 çawa zêde bûye. Hin mintiqe tevi serhildanê nebûn., ji ber ku xelkê wan deran ji dawiyê (ji serketinê) bê bawer bûn. Dı mintiqeyêñ serhildanê da hin gundêñ ku tê da ci negirtin, dû ra poşman bûn; em ji tevlê bana wê rewşa biguhuriya. Dı mintiqeyêñ serhildanê da piraniya memûren dewletê karê xwe bı ci neanin.

Memûren ku min lı vê mintiqê ditin, piraniya wan, weki ew nefi bûne, weki neheqi lı wan hatiye kîrin, xwe nedîdane ber kar û bar.

Qimeta cendîrme tune. Cendirmeyen ji vê mintiqê hatin guhartin û yên beyani û Türk şandın ciyê wan; lê ew ji bı wezifên xwe acız in. Talim û terbiye nedîtine, heya qismek ji wan nizanın ku çekêñ xwe bı kar binin. Heya bajarêñ van deran ji dı qûrêjê da ne û ne gor dilê memûran in.

Wek zanyari lı vir kêm tişt heye û mamos-

teyên xwedi bir û bawer qet xuya nakın. Dar û dezgeyên dibistanên pêşin, hin yê dema sultaniyê ne.

Hakim û dadgeh lı hezaran mehkûm û şikseran dîgerin û bı vi awayi xelk, wek ji nêvi zêtir bı ali dadgehan têne xwestin. Gundi, bêyi ku gotineke turki ji hin bin, têن çarşibaçara bajêr, karê xwe dibinin û zmanê xwe yê Kurdi ji hini wan bajariyan dîkin ku zmanê wan Tîrki, yan ji Erebi ye. Lı hêla serhildanê piraniya gundan ji serhildanê zirarek mezen neditine, heyâ malê xwe buha firotine û bı vi awayi jê feyde ditine.

Ew tediba (cezakırına) leşkeri, bı raya mîn, bı wi şikli nehatiye kîrin ku bikaribe bibe ibrettek mezîn û gundêñ asê bı xwe, pez û dewarêñ wan û zadêñ wan tu zîrar neditine (4). Ew erazi û gundêñ ku ji Ermeniyan vala bûn, nuha Kurd hêdi hêdi tê da ci dîbin. Jî bo hewayê (rewş) baş, Kurd pir jinan (ji yeki zêtir) distinîn û nifûsa wan roj bı roj zêde dibe. Xelkê ku vedigere ci û warêñ xwe yên berê, ku wexteki ji ber êrişa Ûris vala kîribûn, rewş wani abori nuha çêtir dibe. Ew xweşbûn, bı taybeti, dî ali pez û dêwêr da baş xuya dîke. Nuha pez û dewarê ku dikeve para malekê, gor beri şer zêde bûye.

Lî hemû wilayetan propagandeya komeleyên Kurdan yên li der welat berdewam e û tê gotin ku Seyid Evdilla ji ali Şemdinanê, kurê Evdilmecit û Şêx Mehmûd li Cizirê wê zora Tîrkan bibin û bîkevin Kurdistanê. Dibêjin, hêfa Kurdê ku dî serhildana dawi da hatin kuştin dîvê bê girtin, bona vê yekê ji dîvê du bendiyêñ nav eşiran bêñ rakîrin û Kurd yek bin.

Nifûsa beg, axa û serokeşiran berdewam e. Dîgel tedibatê (cezakırınê) ji, hin Kurden ku di bajaran da rûdînîn û mîyla wan ber bı Tîrkan e û hin Kurden ku dî mintiqâ serhildanê da alikariya hukmetê kîrin û diji şêxan derketin, ew ji duwerojê ne bawer in (ne emin in) û tevdîrê hukmetê baş, lê kêm dîbinin. Ev kesanan, ji bo parastina jiyana xwe dixwazîn terki welat bikin.

Evana dîtîrsin ku Kurd, zû an dereng cardîn tişteki bikin û hêfa xwe ji wan bistinîn. Rakîrina aşarê tenê tesireke baş lı gundêñ

"serbixwe" kîriye, lî dî gundêñ axa û began û dî çitligêñ wan da disa hîmberê aşarê, yan piçek jê kîmtîr, wek beş û salme ji gundiyan tê stendin.

Lî pir ciyan qeyd û qûyûdê hukmetê tune. Dî eraziyê da xudan heq ki ye, ne xuyayı ye. Erazi û milkê ku rewşa xwe guhariye, derheqê da tiştek nehatiye kîrin. Lî mintiqêñ çiya ku erd teng e û nifûsa gelek e, piraniya dijayetiyân ji xwediderketina axê pêk tê. Ferqa Dêrsimê ji mintiqêñ dinê ev e ku, lî vir memûren hukmetê zêtir in û ew (Dêrsimi) dijayetiyêñ nav xwe bı çekêñ xwe safi dîkin, ji serokêñ xwe ra zêtir bendewar in û hin ji her çiqas Kurdi xeber didin û ji ber Alevitiyê xwe Kurd dîhesibînîn ji, ew serhişkiya dî derheqa Tîrki da, ku nexwazîn Tîrki hin bin û bı Tîrki xeber nedîn, mîn lî Dêrsimê nedit. Dêrsimi ji wek ehlê mintiqêñ dinê xudi çek û silahêñ agirber in û gor adetên xwe ji bo êrişbirîna der û dorêñ xwe lî fîrsendan dîgerin. Bî taybeti, ji ber ku heyâ nuha tedibeke temam (qet'i) nehatiye kîrin û tevgera 332 (1916) bê ceza maye, ew ji vê yekê curetê distinîn (5).

Hin kesen ku ev serhildan tertib û teşwiq kîrine hin nehatine girtin. Rêbiri û karwan şêlandîn kêm nabe. Gelek xort, çaxê wanê eskeriyê hatiye û lî meydanê ne, lê naçîne esker.

Xani û qonaxêñ hukmetê xîrab bûne û di rewşekê pis da ne. Qereqol û qonaxêñ nehyan wek holikêñ adi û axuran in. Ev yek zirarek mezîn dide êtbar û şerefa hukmetê.

Tiştê ku mîn ditin hûr hûr neqîl kîr. Gotina mîn bı kurti ev e:

1- Lî rojavayê Feratê wilayetê Meletyê ji di nav da, lî wilayetêñ rojhîlata Feratê nifûsa Kurdan yê qeydkiri ji mîlyon û sed hezari zêtir e. Yê ku ne nîvisandi û ne qeydkiri ne, lî deri vê hejmarê ye.

2- Nifûsa Tîrkan ji çaryekê nifûsa Kurdan kîmtîr e. Eger yên ne qeydkiri û ne nîvisandi ji bêñ hijmartin, hîngê ji pêncan da yeki ji kîmtîr dibe.

3- Kurdan zmanê xwe bı ser xîstine û bêyi ku muhtaci hinbûna Tîrki bin, dikarin hemû karêñ xwe bı rîva bibin û di sedi da 80 mîrê turk ji mecbûr hîstine ku Kurdi hin bin.

4- Serhildan tevgereke milli ye di bin perda

din da ye.

5- Dî mintiqâ serhildanê da memûrên dewletê kar û barêne xwe bî ci neanine.

6- Hemû memûrên dewletê (yêne vê mintiqê) dî dereceke nîzîm da ne gor memûrên rojava û merkezê. Xwe wek kesen nefikiri û neheqi lêkiri dibinîn, ji bo wezifê bêndlû sîst in.

7- Cendirme bî kîyfiyet (cawani) gelek şunda ye.

8- Dî bajar û gundan da qirêji berdewam e, memûrên xwesiyê tunin.

9- Karê avahiyê gelek şunda ne.

10- Hakimên dadgehan ji pêkanina dadiyê (adaletê) zêtür, dibin haletê fesadi û neheqîyan. Ji xelkê bî hezaran kes wek şikser û mehkûm bûne firari.

11- Jî aliyê zanyari mamoste ji gelek kêm û şundamayı ne.

12- Tedibat (cezakîrin) ne bî wi şikli hatiye kîrin, ku bîbe ibretek mezîn; piraniya gundênu seri hildane, bî aliyê can û mal zîrar nedîne û piraniya kesen ku seri kişandîn hin nehatîne girtin.

13- Gundênu seri malê metrûke ne, Kurd hêdi hêdi tê da ciwar dibin.

14- Nîfûsa Kurdan her diçê zêde dibe.

15- Xelkê ku ji macîriyê vege riyan rewsa xwe yê abori baş e.

16- Xani û qonaxê hukumet û qereqolan li pîr ciyan gelek xîrab in û li ser xelkê tesireke başnakin.

17- Piraniya eraziyan bê qeyd in. Beşa eraziyê nayê stendin. Nehatiye nîvisandin.

18- Rakırına aşarê tesira xwe li ser gundênu beg û axan nişan nedaye; nîfûsa serokeşiran û axan wek berê ye.

19- Dêrsim dikare zûtûr bê helandin (asimile kîrin).

20- Jî bo serhildaneke nû propagande berdewam e. Bî her awayi gelek kar û xebat tê nişandan ku ramanê tolgirtinê dî nav gel da baş ciyê xwe bîgrin.

21- Ew kesen ku mîyla Kurdiyê nekîrin û dî warê serhildanê da alikariya hukumetê kîrin ji duwerojê û jiyana xwe ne bawer in û dixwazîn ciyê xwe terk bikin.

22- Çek tenê dî mintiqâ serhildanê da kom bûne. Lî hemû ciyê din hin gelek çek hene.

TÊBINI:

(1) Dî vê gotinê da gelek nerasti hene. Yek ev e ku, xudiyê raporê xelkê bajaran, xasima yêne ku Türkî dizanîn, wek turk nişan dide; lê ev ne rast e. Diyarbekir, Ruha, Mûş û yêne din, di van bajaran da wê wextê, yê ku Türkî dizanibûn ne hemû Türk bûn. Piraniya wan Kurd bûn û Türkî ji hin bûbûn. Iro ji usa ye. Her usa ji, wê demê dî bajaran da hin kes ji, dibe ku bi rasti Türk bûn, yan ji xwe Türk dihesibandin. Lê şik tune ku hejmara wan gelek kêm bû. Pir caran ew qismek jê memûrê dewletê bûn. Iro ji usa ye. Wek misal: raporê da tê gotin ku Owacix û şes gundê wê Türk in. Bila şes gund li wir bimine, qet Tirkek ji wê wextê dî gundeki Owacixê da tune bû û iro ji tune. Owacix bi xwe ji bi tevayi Kurd e; lê iro, helbet çend memûr û gelek polêz û eskerên Türkân tê da ye, wek hemû bajaran Kurdistanê. Lê ew beyani ne, tum diguhurin, têne û dîçin. Xozat (Hozat) ji usa ye, Palo ji, Bitlis û Erdîş û derê din ji.

(2) Dî vê hevokê da xeletiyek heye. Divê, yan bîhata gotin "Kurdan.... Türkî hin bûne", yan ji "Türkân.... Kurdi hin bûne".

(3) Welatparêzên Kurdan di sala 1912 li gelek ciyênu Kurdistanê rêxistin çêkiribûn û bo şerê azadiyê xwe hazir dikirin. Dî sala 1913'da li hêla Bazidê, Xoy û Motkan Kurdan diji zordestiyê hukumetê derketin. Piştra li dora Bitlisê serhildaneke xurt çêbû. Ew bûyer dî diroka Kurdistanê da wek "Serhildana Bitlisê ya 1914'an" tê zanin. Xudiyê raporê behsa vê bûyerê dike.

(4) Mebûsê Türk xwe ji xwedê dike. Ji ber ku, piştî vemirandina serhildanê leşkerê Türk êriş bire ser hemû gund û bajaran ku di mintiqâ serhildanê da ci girtine, çi tevi serhildanê bûne, çi nebûne. Qasi 30.000 insanê masûm, jin, zarok, kal û pîr ji nav da, kustîn. Gund gewitandin. Pez û dewar û zad telef kîrin. Lê xuyaye, dilê vi zalimi ji van kîrinan têr nabe, dixwaze ku koka Kurdan bîhata, Kurdistan vala bîba.

(5) Weki tê zanin, Dêrsimi di serhildana Şêx Said da bê deng man, tevi serhildanê ne bûn. Lê xuyaye, disa ji mebûsê Türk ji wan ne razi ye û li fîrsenda cezakîrineke mezîn digere. Li dawiyê usa ji bû: Dî 1938'an da ewana Dêrsim ji quirkirin. Ev yek ji baş nişan dide ku ji bêdengi û revê feyde tune. Yê ku himber dijminê xwe yek nebe û bî hevra dernekeve, tenê karê dijmin hêsanter dike.

JINÊN KURD

Yamlûki xanım tewn dani,
Zerife, Yaşar û Leyla
Û ên mayin
Kerkîte bernedan...
Bî zenda zer, bî destê� nazik
Her çêkîrin...
Dî sala 1919 an da
Bî nexş û nigarê� bedew
Me guliyê� wê hûna
Kubar, kubar rêsîyan şekir
Seba jinêن Kurda.
Xet bî xet kîr dorberê wê,
Bû behra rengan
Bî şîklêن xweşîk xemîland
Ku ciki vala nemine
Lî nav erdê� me,
Her maqûl û ciwan danışın
Û hêz bin em tevayı...
Tej û tejber
Xaliçe û berê� me çêkiri
Bî salan keda eni rêtî
Me raxiste ber piyê
Govenda welatê xwe...
Eviniya welat, jî dayik bûyinê
Lî ser dîlê me hêwiriye
Tiş tişi bûye dîl,
Ev dîl..
Teyax dîde ev dîl
Bayê azadiyê pêçaye
Canê me yê nazik û pola
Û
Pê kutaye erdê ev dîl
Bo azadi,
Bo wekhevi...

Vazgal 1989

GİHİŞTİYE SERDEMA

ZEMBİLFIROŞ

A. GERNAS

LI SER EFSANEYAN KURTERAWE-YEK

Gava mijara "Folklor" dikeve rojevê, bî gelemperi hemû afirandinê gelêri, ango çanda gelêri rûbari me dibe. Çanda gelêri wek didem hemû cûre wêneyên jiyanê radixe pêş çavê me, wek tarix, urf û adet, felsefa jiyanê, baweri, başı û xirabi, pêwendî û heta rabûn û rûniştinê gelek mijarêñ din diroka gelan bî iro va dikeline, dî navbera jiyana kevin û nû da torek dîrêsinê. Me derheqa jiyana kevin da agahdar dike, jî bo pêşeroja millet dibe delil û huviyetek dide millet. Jî ber vê yekê her parçeyek çanda me ya kevin, himeki diroka me ya neteweyi ye, hebûna me ye, serfirazi û serbilîndiya me ye. Gel bî riya stranan, çirokan, destanan, efsaneyan, gotinê pêşîyan, tiştenokan, deraninan, listikan, şin û şahiyan, govend û dilanan û gelek awayên din van bermahiyân dîspêrin hev û wek emaneteki piroz jî nîşeki derbasi nîşeki din dikin.

Dî vê nivisarê da, jî efsaneyên Kurdan yeki, ango "ZEMBİLFIROŞ" hildibjêrim û bî çiroki pêşkêş dikim. Piştre jî, çend varyantên vê efsaneyê rûbari hev dikim da ku bala xwendevanan bikêşim ser xizna folklorâ me û jî bo lêkolinen xurttir kevireki biçük dî vê asasê da bî cih bikim.

DIYARIYÊN PİROZ YÊN PÊŞİYÊN ME

Wek gelek efsane, destan, çirok, şîr, stranêñ me yêñ gelêri û gelek bermahiyên folklorâ me, efsaneyâ Zembilfiroş jî, dî nav gel da hatiye gotin û bî çi kul û hali gihiştiye serdema me. Heta ku gihiştiye serdema me ya iroyin, dî nav gel da gelek varyantên wê ji hatine afirandin. Hebûna varyantan tu car nabe sedemê qelsbûna folklorâ me, li ser dewlemendiya wê si çê nake. Ez bî ditinek berevajiyê wê li vê mijarê dînihêrim, ango varyantên bermahiyên me yêñ kevin wek dewlemendiya çanda Kurdi, zimanê wi û neteweparêziya gelê Kurd dibinim. Lî ali din ez hewce nabînim ku pirsa "gelo jî van varyantan kijan rast e?" jî jî xwe bikim. Jî ber ku di efsane yan ji mitolojiyan da pivanêñ ilmi, pivanêñ mantiqê xwedi hukmeki ninn. Gava behsa pivanêñ ilmi û mantiqê dikum, qed ne inkariya wan e, qed, legerina bingeha rasti û nerastiya efsaneyan e. Ango em, wek ilmi nikarin yek bî yek kevireñ efsaneyê li gor hukmê mantiqê bî cih bikin. Bî gotineke din, divê meriv di efsaneyan da li mantiqê negere. Dî lêkolina efsaneyan da hukmê ilm û mantiqê wek metod heye, lê jî bo kifşkirina efsaneyê, jî bo kifşkirina serdema wê, jî bo kifşkirina diroka wê, jî bo stila jiyana serdema efsaneyê û wd. heye.

Dî nava berhemên folklorî da efsane, bermahiyên heri kevintir in. Dî afirandina efsaneyan da gel, bî baweri û fantasiyên dema xwe, şirovekirina dinya û sırustê, bî



ramanên azad berhemên folklori çekirine. Bî gotineki din, çawa li xweşa wan çûye wîsa afarindine û ez bawer im ku, jî xwe pîrs ji nekirine "gelo piştî me wê xelk bî van çirokan bawer kîn an na." Lewra di çirokên xwe da qehremanên wîsa peyda kîrîne ku, ew tu astengi nas nakîn, qeweta wan serdestê her tuşti ye; tenê bî serê xwe bî dêwêñ heftseri ra şer dikin, ordiya jî hev belav dikin; li hespêñ xwe yêñ bayê, li hespêñ behrê siwar dibin û riya şes mehan dikin şes saet; bî çengeki ava deryayê dayika qehreman bî hemle dibe û qehreman jî devê dayika xwe diwelîde (efsaneuya "Memê Alan"); jî serê kel û bircan xwe davêjin, lê pozê wan ji xwin nabe (Zembilfiroş) û hwd.

Lî gor raya mîn rasti ew e ku, çirok, efsane, destan û yêñ mayin bî motivêñ giranbiha, bî hostatiya zérkeran hatine afirandin û wek diyariyêñ piroz di nav gel da hatine parastin. Xelkê jî wana hez kîrîne û bî sedsalan, bî hezar salan bê nivis, bê kitab û defter wana bî xwe ra heta dema iroyin jiyandine.

Berya ku em derbasi şirovekîrîna motivêñ folklori yêñ Zembilfiroş bibin û varyantêñ wi rûbari hev bikin, divê bête zanîn ku efsaneuya Zembilfiroş wek afirandîneke Melayê Batê tê pejîrandin û behsa destnîvisareki wi ji tê kîrin. Jakêlin Sûrenovna Mûsaelyan (Kurdnas û folklorzaneke Sovyeti ye) di 1978'an da dehdozdeh varyantêñ Zembilfiroş rûbari hev dike û pêra ji behsa efsaneuya destnîvisari dike. Lî gor agahdariya wê, ev destnîvisar

a Melayê Batê ye û dî sedsala XVIII'an da jî ali Mûrad Xan Bayezidi va, jî nû va hatiye nivisin. J.S.Mûsaelyan dî légerina xwe da li ser kêş û qafîye, lhîhevanina rîz û bendêñ varyantêñ destê xwe dibe û bî vi awayi dîgîhije wê baweriyê ku, efsane jî ali Melayê Batê (bî şîerkî) hatiye nivisin.

Ez ê ji nîha li jêr, varyanteke Zembilfiroş a ku li dora Diyarbekir tê gotin, bî çiroki pêşkêsi xwendekaran bîkîm û piştîre ji li ser motivêñ wê yêñ folklori û rûbarihevkiîna çend varyantan wê hînek bisekinim.

EFSANEYA ZEMBILFIROS

Dî serdemeki kevnare da mirek û kurek xwe hebûne. Teled-weledê mir her ew kur bûye . Jî ber wê yekê ji, li ser destâ , bî nazîki hatiye mezinkîrin. Kurê mir bî ser û sincê xwe, bî xweşîkbûna xwe, bî bejîn û bala xwe bê quşûr bûye. Dî wê jiyana debdebe da lawîk mezin bûye, ketiye çax û bengê xwe, bûye xorkeki ciwanmerd.

Kurê mir gelek caran bî wezirê bavê xwe ra derdiket nêçirê, derdiket seyranê. Roje-ki ji rojan disa ew û wezir ji nêçirê vedigerin malê. Lî ser riya malê di ber goristaneki da derbas dibin. Dî goristanê da tuşteki bala kurê mir dikşîne. Lî ser rûyê goreki qafîkê serê insaneki dibine, radîke qafîkê seri û bî meraq lê dinihêre. Heta wê hingê derheqa mirin û piştî murinê tuşteki hin nekuriye û nebîhistiye ji. Lewra jiyana wi ya dewlemed û rengin, cwata dora wi ji purseki weha dûr bûne.

Kurê mir bî meraq û ecêbmayı ji wezirê bavê xwe pîrs dike:

- Wezir, tu dikari bêji gelo ev ci hikmet e?
- Ev, qafikê serê insaneki muri ye mirê min, dibêje wezir.

- Mirin ci ye?

- Mirê min, hemû insan û hemû mexlûqên bi can ên rûyê dinê demeki dijin û piştre dimrin. Pişti mirinê wana binax dikin û demek şunda muriyên binaxkiri dikevin vi hali.

- Ew ji ber birçibûnê yan ji sedemek din murine?

- Pêşiyên te mir bûne, lê ew ji mirine mirê min, ji ber ku mirin guhdariya dewlemend, seqir, ciwan û kal û pir nake. Rojeki tê herkes dikeve tora wi, yani kes nikare xwe ji mirinê xilas bike.

- Yani tê wê maneyê ku, ez ê ji rojeki bûmrim û bikevin vi hali?

- Belê mirê min, wexta roja me temam bibe tu ji, ez ji, yani em hemû dumrin, dibêje wezir.

Pişti vê xeberdanê kurê mir dikeve ramanen kûr, dikeve xeyalan. Hestêni wi coş dibin û evineke Xwedayı di dilê wi da gul vedide. Dighije qesrê, bi girin syda dibe û bîryara xwe dide ku, dev ji mal û milkên xwe, ji miritiyê, ji jiyana debdebe berde û di riya Xwedê da bi keda destê xwe derê jiyaneke nû li xwe veke. Piştre gazi jina xwe dike, fikir û ramanen xwe jê ra dibêje. Ü dibê, "ez ji iro pêda dev ji hemû mal û milkên xwe, dev ji selteneta xwe berdidim. Ez ê edi bi keda destê xwe jiyana xwe bidominim. Eger tu dixwazi bibi şirikê vi jiyana seqir û dev ji seltenetê berdi, bi min ra wer em ê serê xwe hildin û ji vi welati herin. Na eger ev jiyana dewlemend bi te şirin tê û dev jê bernadi, em ê ji hev veqetin." Jina wi dev ji mîrê xwe bernade û dibêje: "Çawa di rojên xweşî da li ba te bûme, di rojên tal û teng da ji ezê li ba te bim û jiyana te ya seqiri par vakim."

Kurê mir û jina wi warê bav û kalên xwe terk dikin. Qonax bi qonax, bajar bi bajar digerin û aboriya xwe bi çêkirin û firotina zembilan diborin. Sal û zeman derbas dibin, zarokên wan çê dibin û roj bi roj barê girantir dibe, bli cilênen ser wan tu tişteki wan namine.

"

Zembîlfiroş lawkê rewal bû,
Bî kulfet û ehl û eyal bû,
Husneki üsif li bal bû
Heq rizaqê qismetê."

Bî haleki koçemal têñ bajarê Farqinê û li

wê derê bi cih dibin. Kurê mir kolan bi kolan zembilan digerine û bi diravêñ zembilan xwe û malbata xwe didebrine. Ji ber firotina zembilan ji, navê ZEMBİLFIROŞ distine.

Rojeki wek her roj disa derketiye kolanan û zembilan difroş. Jina mirê Farqinê disa derketiye ber şibakê û çavdêriya Zembîlfiroş dike. Lewra ew ne bi dilek bi heft dilan aşiqê husn û bala Zembîlfiroş bûye:

"Zembîlfiroş zembila tine
Kolan bi kolan digerine
Xatûnê li hewale dibine
Hiş diçe aqîl namine."

Xatûna jina mir xwe ranagire, cariye û xulaman dişine pey Zembîlfiroş û wi tine qesrê. Derdê xatûnê ne bazarkirina zembilan e, vemirandîna evin û agirê nava dilan e.. Xatûnê bangi Zembîlfiroş dike û dibêje:

Zembîlfiroş lawkê dewrêş e
Kerem ke tu were pêş e
Qimeta selka tu bêje
Ez ji hizna te bûm kerr û gêj e.

Zembîlfiroş lawkê biyani
Kerem ke tu were bani
Qimeta selka tu zani
Xelk xam e tiştek nizani."

Herweha Xatûnê niyate xwe ji Zembîlfiroş ra aşkera dike û dixawaze pê ra rakeve û eşqê bike. Lê Zembîlfiroş ji ber evîna xwe ya Xwedayı û dilpaktiya xwe, tek-lisîn Xatûnê qebûl nake û bi van gotnên bersiv dide:

Xatûnê wez tobedar im
Delalê bi erz û eyal im
Zarok birçi ne, li mal in
Ji ber rebê jori nukarim.

Xatûnê bi hemû bedewi û serweta xwe, xwe pêşkêsi Zembîlfiroş dike, lê dike û nake Zembîlfiroş ji rê dernayê. Her cara ku Xatûnê di ber Zembîlfiroş dide, evîna dilê wê hartir dibe û dikeve rikê. Xatûnê bêçare dimine û Zembîlfiroş di qesrê da hepis dike. Di navê da çend roj derbas dibin. Her rojek ji bo Xatûnê dibe murinek. Ew çiqas ji bo eşqê li razikirina Zembîlfiroş digere, Zembîlfiroş ji ewqas ji bo berdana xwe lavayıya dike:

"Xatûnê bi gerden mori

Şuxul nabin bî koteke û zori
Tîrsa min jî rebê jori
Xatûnê wez tobedar im.

Zembîlfiroş dînihêre ku ji destê Xatûnê xilası tune, ji bo destavê û dest û rû şûştinê jê destûr dixwaze. Xatûnê ji ber tîrsa reva Zembîlfiroş, beneki li lingê wi girê dide, serê ben dike destê xwe û tevi misineki Zembîlfiroş dişine birca heri bilind. Zembîlfiroş di bin çavdêriya xulam û eskeran dertê serê bûrcê û ji aliki va ji difikre ka çawa xwe ji destê xatûnê xilas bike, ji wê derê bireve. Li ser bûrcê li der û dora xwe dînihêre, lê tu rîyek revê û xilasiyê nabine. Wê hingê benê lingê xwe vediye, bî misinê va girê dide û xwe ji birca bilind davêje xwarê. (Ew kela han bî navê "Kela Zembîlfiroş" tê bî nav kîrin û ev kel li Farqînê ye)

Ew kela ku Zembîlfiroş xwe jê davêje, keleke wisa bilind e ku xilasiya merw mûcize ye. Eger ci hikmet be em nîzanîn, lê pozê Zembîlfiroş ji xwin nabe. Hema wê hingê radibe ser xwe û baz dide malê

Demek şunda Xatûnê dikeve meraqê û ben dikşîne, lê dîlva Zembîlfiroş misin tê ber destê wê. Wê gavê têdigihije ku Zembîlfiroş reviyaye. Kêfa wê direve, dinya li serê wê tari dibe. Xatûnê ji kerba evina Zembîlfiroş dikeve haleki ne hal, şev û roj lê dibin zindan, xeyalê Zembîlfiroş ji pêş çavê wê naçe. Bi vê evin û keserê cilêن xwe diguhêze û bî rojan li kuçe û kolanêن Farqînê li mala Zembîlfiroş digere. Di dawitiye da digihije mirazê xwe û mala Zembîlfiroş dibine. Bi cil û ser û sincê xwe yê guhazti, kes wê nas nake. Herweha di wexteki ku Zembîlfiroş ne li mal e, Xatûnê diçê ba jina wi û pê ra xeber dide. Bi lavayî, bî zêr û ziv û bî bertilan jînikê razi dike, yani wê dixapine da ku şeveki dîlva jînikê da bikeve nav lîvinen Zembîlfiroş.

Ew şev cilê jina Zembîlfiroş li xwe dike, dikeve nav nîvinan û li benda Zembîlfiroş dîsekine. Derengê şevê Zembîlfiroş westiyayî û ji halketi tê malê û dikeve nava lîvinan. Çura vemirandiye û haya Zembîlfiroş ji tişteki tune. Demek şunda Xatûnê xwe diqelêbe û berê xwe dide Zembîlfiroş. Gava Xatûnê berê xwe didê û xwe aliki diqelêbe, şingini bî xîrxalân zîvin ên lingê wê dikeve. Bi dengê xîrxalan, Zembîlfiroş vedicenîge û tê derdxîe ku eva han ne jina wi ye. Lewra dizane ku, di lingêن jina wi da xîrxal tunene. Li rûyê jînika paşîla xwe dinuhêre û bî nihêrtinê ra ji nava ciyan dipeke. Xatûnê nas dike. Hema

wê hingê bî lez xwe davêje der, serê xwe hildide û berê xwe dide çiya. Xatûnê ji bî dû dikeve û lê digere.

Zembîlfiroş mîze dike ku, rev ne çare ye û ji mirinê pêştir tu tiştek wi ji destê Xatûnê xilas nake. Çok dide erdê û bî girin lavayı li Xwedê dike da ku rhê wi bistîne û wi ji vi ezabê xilas ke. Xwedê daxwaziya wi bî cih tîne û herweha Zembîlfiroş diçê heqîya xwe, digihije evîna Xwedayı. Hingê Xatûnê digihije ser Zembîlfiroş û mirazê wê dî dilê wê da dimine. Li xwe dixe, ax û fizar dike û ji kerba evîna xwe ew ji li wê derê diçê heqîya xwe.

Li gor efsaneyê, Zembîlfiroş û xatûnê li rojhîlata bakûrê Farqînê, 5-6 km dûri bajêr hatine gor kîrin.

MOTİVÊN FOLKLORI YÊN EFSA-NEYA ZEMBİLFIROŞ

Dî efsaneyâ Zembîlfiroş da gelek motivên dewlemend û cihê (ji efsaneyên Kurdi yêن din cihêtür) hene. Efsane, wek destan û efsaneyên Kurdi yêن din xwedi dawiniyeke trajedik e. Lê mijara evinê, ku mijara se-reke ye, rengeki cuda nişan dide û bî dide-meki cuda folklorâ me ya Kurdi dewle-mendtir dike. Ya din ji, didema tesewîfî ye, ango "evîna Xwedayı" ye.

Motivên efsaneyâ Zembîlfiroş ji van xa-lêñ jér pêk têñ:

- **Terkirîna miriti û mal û milk:** Zembîlfiroş bî eslê xwe mir e û ji maleki dewle-mend e. Ew ji bo xatirê baweriya xwe dev ji miriti û seltenetê berdide.

- **Fedakari û dîlsozi:** Jîna Zembîlfiroş fedakariyê dike, dev ji jiyana xweş û dewle-mend ber dide û li hember mîrê xwe dîlsozi nişan dide.

- **Bîlîndkirîna qedir û qimeta destka-ri (sinetêñ destâ):** Zembîlfiroş dev ji hemû hebûnêñ xwe ber dide û bî çêkirîna zembilan û firotina wan, ango bî keda des-tê xwe, xwe û malbata xwe didebrine.

- **Evindariya bî çavpêketînek:** Xatûnê bî çavpêketîna yekem benginê Zembîlfiroş dibe.

- **Evîna yek ali :** Xatûnê ne bî dileki, bî heft dilan benginê Zembîlfiroş dibe, lê ev evin yek ali dîmine û Zembîlfiroş bersiva vê evinê nade. Ango Xatûnê dike û nake Zembîlfiroş ji rê dernayê û pê ra ranakeve, nakeve kîf û henekan.

- **Durusti û exlaqeke payebilind :** Ne xweşikbûna Xatûnê, ne mal û milk û ne ji tehdid û zor Zembîlfiroş ji rê dernaxe. Ew bî malbata xwe ra sadîq dîmine, bî baw-

riyên xwe va gîrêdayî dîmine û ji bo xatirê van prensiban, xwe ji kelê davêje û quesda xwekuştinê dike.

- **Evin, hezkîrin bî darê zorê nabe :** Xatûnê gelek rîyan diceribine da ku bigihije mirazê xwe. Zembilfiroş tehdit dike, wi dî qesrê da gurti dihêle, lê encama van kiryaran nişan dide ku, bî zorê tiştek naçe seri.

- **Xapandin û plana revê :** Zembilfiroş ji bo şeref û baweriyên xwe, bêçare dîmine û bî plan û xapandinê ji kelê direve.

- **Evina Xwedayı :** Evineke Xwedayı dîkeve dilê Zembilfiroş û ew jiyanekî feqiri hildibjêre.

- **Gebûlbûna duayan :** Reva Zembilfiroş ji, wi ji destê Xatûnê xîlas nake. Xatûnê xwe digihine mala wi û heta nava nivinêni wi. Zembilfiroş êdi tu rîye ki nabine, direve çiya û li wê derê lavayîyan ji Xwedê dike da ku rîhê wi bistine. Xwedê duayêni wi qebûl dike û bî dawîniyeke trajedik dimre.

- **Evina yek ali lê rasti :** Xatûnê ji bî dû Zembilfiroş dîkeve. Xwe digihine ser cendekê Zembilfiroş ê miri. Ew ji ji kerba li wê derê dimre.

Kurtenasiyek li ser varyantên Zembilfiroş

Dî bin destê min da, ji bili varyanta jorin, çend varyantên din ji hene. Ji van varyant, berevoka Heciyê Cindi ("Epikên Kurdi") û ya Ordixanê Celil-Celilê Celil ("Zargotina Kurda") temamiya efsaneyâ Zembilfiroş pêşkêş kîrine. Yê mayin, ango berevoka A. Sosin, berevoka Prof. Qanatê Kurdo, ya Kamûran Ali Bedirxan û wd. tenê beşek ji efsaneyê (bî şîérki) pêşkêş dîkin û berevokên wan bî naveroka xwe wek varyanta jorin e. Lê dî berevokên Heciyê Cindi û Ordixanê Celil-Celilê Celil da hin cudayı hene:

Cudayı 1- Destpêka çiroka Zembilfiroş ne wek hev in. Lewra dî çiroka jorin da Zembilfiroş, dî destpêkê da wek kurê Mireki bî hukim û hebûn tê nasandîn. Ew piştre derbasi jiyanekî feqiri dibe û ji ber baweriyên xwe bî keda destê xwe jiyanâ xwe didomine. Ev mijar, dî berevokên H.Cindi û yê din da ne xuyaye, ango çirok bê seri ye.

Cudayı 2- Dî varyanta jorin da, jîna zembilfiroş wek jîneke dilsoz tê xuyan. Gava Xatûnê tê mala Zembilfiroş, lavayîyan ji jîna wi dike û derd û evina xwe jê ra dibêje, dilê jîna Zembilfiroş pê dişewîte û bî vi awayi destûr dide Xatûnê da ku dî nav

nivinêni wê da rakeve. Lî di berevoka O. Celil û Celilê Celil da, jîna Zembilfiroş timatiya malê dinê dike û ji bo pere û zér û ziv Xatûnê di nav nivinêni xwe da dide razandin.

Cudayı 3- Ne wekheviya dawiya çirokê ye. Dî çiroka jorin da Zembilfiroş dî nav qesrê da û li ba Xatûnê tê hepîs kîrin. Mirê Farqinê, ango mîrê Xatûnê ne li mal e. Lî ev mijar di berevoka O. Celil û C. Celil da rengeki din stendiye, ango Zembilfiroş bî fermana Mirê Farqinê tê zindankîrin û kuştina Mirê Farqinê bî destê Zembilfiroş tê nişandan!..

Cudayı 4- Reva Zembilfiroş e. Dî çiroka jorin da Zembilfiroş, bêçare dîmine û xwe ji kelê davêje xwarê (navê "Kela Zembilfiroş" a Farqinê ji, xasîma ji ber vê bûyerê ye). Lî li gor çiroka "Zargotina Kurda" Zembilfiroş, pişti kuştina Mirê Farqinê derê zindanê vedike û bî peyati direve.

Cudayı 5- Dî çiroka Zembilfiroş a "Zargotina Kurda" da, Zembilfiroş, rengeki balkêş distine!.. Ango, Zembilfiroş wek Ezidi tê xuyan. Lî dî varyantên din ên heyi da, ew bî felsefa tesewîfi ya islami tê rawekîrin.

Lî gor raya min ev mijara balkêş, xusûsiyeteki Kurdan ê din ji radixe pêş çavan. Ev xusûsiyet ji ev e, ku olên cuda nebûne sedemê nakoki û berberiyên navbera Kurdan. Ango, dî jiyanîna bermahiyên neteweyi da, din ci dibe bila bibe, bî rîhê Kurdiyi çirok, efsane, stran, serpêhati û hemû bermahiyên geleri hatine parastin, hatine hezkîrin û her yek ji wan bê zordayînê van bermahiyân wek malê xwe hembêz kurne û jiyanîne. Bî gotineki din, rîhê Kurdiyi raseri olên Kurdan (musulmani, eziditi, filehi, cihuti, elewîti û wd.) bûye.

Min li jorê ji got, ku em dî efsaneyan da li rastiya mantiqi nagerin. Lî eger destnîvisara Melayê Batê dî destê me da hebûya, wê hingê meriv dikarîbû varyant baştı rûbari hev bikira û bizanibûya ka kijan varyant wek destnîvisarê ye, kijan mintiqeyi ye, kijan dî bin tesira din da maye, kijan û bî ci awayi li gor devoka navçeyi hatîye jiyanîn û wd. rawe bikira û ditinê xwe pêşkêş bikira.

Dî gotina dawi da dikarîm tişteki din ji bidim xuyan, ku varyantên Kurden Sovyete, piraniyê wan, bî devoka wan hatine nivisin, dî çiroka şîérki da kês û qafîye, rîz û benden çirokê ji yê din gelek dûr ketiye. Ango dî şîér da, kêm malikên şîrê li yê din dînihîrin.

- Bîra rê be, bîra dûr be.
- Bîra mîrov mîr be, rokê lî dînê be.
- Zîkê têr haj ê birçi tune.
- Beniştê dêhna (dina) jî rîtlê ye.
- Yê ku dest dîke , dê û bav nake.
- Çiya tune ku rê pê nekeve.
- Heta mîrînê çav lî kîrînê.
- Yek heye bî sedi, sed heye ne bî yeki.
- Zêr zane, mor zane devê tîvingê mor zane.
- Qenc dîbe dewsa xencera, sax nabe dewsa xebera.
- Kes nabêje dewê mîn tîrş e.
- Mala Xwedê bî sebrê ava bûye.
- Bîra lî erş be, bîra ne lî ferş be.
- Hezar dost kêm ìn, dijmînek pîr e.
- Qenci kîro bî xwe kîro, xerabi kîro bî xwe kîro.
- Heta hevraz nekeve ber te qedrê berjêr nîzani.
- Dizikê got: "Bînê mîn zêrin e." Heskê got: "Ma ez jî ku têm?"
- Roviki geriyayi jî şêreki negeriyayi çêtir e.
- Jî rovi zexeltir tune, lî sûkan jî postê wi bêtir tune.
- Newal xali ye, rovi wali ye.
- Tîstê çû nede dû.
- Şeva reş dî êvar da xuya ye.



Berevkar: Salih Omeri

JINÊN KURD ESİL IN

Ev nivis ji pirtûka "KÜRTLER ÜZERİNE" (Tarih ve Folklor Yazları), ji nivis-sara **Thomas BOIS** hatiye wergerandin. Pirtük bi xwe ji pênc bendên pênc niviskarêñ cuda pêk tê. Ew dî nav weşanêñ Özge da bi Tirkî derçûye.

Werger: A. BAWER

Jiyana heri çalak, dî dema şerê navbera şivanan an ji eşiran da piçek sekan dibe. Nêçirvan ji xenimetên bîdestxisti malêñ xwe dixemilinin û piştre çekêñ (silahêñ) xwe ji ber xwe va datinîn. Şivan, rîncber, rezvan ji bo karanina hizûra heqkiri, ji bo avêtina giraniya kar û xebatêñ rojê ûbihndayinê, lî ocaxeki malbatî ya xwe digerin û viya pir ji dixwazîn. Gava dîbinin ji, pê kêfxweş dîbin. Berpîsiyariya nava malê dî destê jinan da ye. Jin, dî nava cîvatê da xwedi ciheki baş e. Cihê ku xeta karektera Kurdan a ruhi nişan dide, ev e.

Lî Kurdistanê ezepi maqûl nayê ditin.. Û ev qet naqewime.

"Mêr bê xwedi, jar dîbin,
Jin bê xwedi, har dîbin."

Fahişeti, ji ali Kurdan va nayê zanîn û naskîrin. Dî vi warî da, ancax bî peyvîn ku ji Tîrkan hin kirine xeber dîdin û texlid dîkin. Jîxwe dî emreki gelek cîwan da dizewicin. Mêr dî 15-16 saliyêñ xwe da, keç ji 12 saliyêñ xwe da dizewicin.

Tevi ku musulman in ji, Kurd, hînek rewşen awerte ne tê da, qet ji pirjin ninin. Carna serokê eşirê, ew ji ber berjewendiyêñ xwe yên siyasi bî gelek jinan ra dizewicin. İsmail Axa Simkoyê navdar, pişti qirkirina filehêñ İrani, dî dema Şerê Mezin da, bî 14 jinan ra zewciye. Lî ev büyer tişteki xerib û nediti ye. Min bî xwe dî wextê birin an ji xwestîna jina wi ya şesan da, serokeşirê Ezidiyan Seid Beg nas kîr. Ji bo keçek û nîfşa wê, sihûdeke mezîn e ku ji ali Seid Beg ê piroz va bête kifşkirin û xwestin. Mêrên cîvatê, ji kar û barêñ malê yên tevlîhev û kîryarêñ ku acizi peyda dîkin, direvin. Lewra, "mêrê du jina" dergevani dike. Büyera berdanê ji, kêm tê ditin. Merîvê ku jina xwe berde, dikeve ber tînazar. Ji bo kesen ku vê daxwaziyê dîkin, tenê rîyek heye : Terikandina eşirê.. yan ji bî hindikayî çespandîna strana jîr bî cih

bine :

"Jinê delal, ji mîrê xerab
Têtine kuştin, nayêne berdan." (Hawar, hejmar 7)

Ev, bî gotîneki vekiri, ji bo bîncîlkirîna pîrseke nazîk şîklê çareseriyeke radikal e. Eger li ali din, jin xwedi sîc û guneh be, mîrê ku ji bo namûsê jina xwe bikuje, ji ali herkesi va tê parastin.

Berevajîyê tiştên ku lî welatêñ islam têñ xeyalkîrin, dî nav Kurdan da jin, dî çarçeva wekheviyê da wek mîran e. Jin pûsi navêje ser rûyê xwe. Rêvebiriya kar û barêñ malê dîkin. Dî mesrefan da azad in. Gava xeribek tê mala wan, jin dikare bî gengazi bikeve nava cîvatê û bêyi dîlhiştinek, dikare beşdari hin xeberdanan ji bîbe. Mîrê Kurd, dî rastiyê da wek hemû tiştên din, heta dawiyê bî jina xwe bawer e. Ji bili vana, ji ramanê jinê yên fireh ji berjewendiyê digre. Ev, bî gelempéri fikir û ramana jinê ya payebilind pêk tine. Nexwe, ji ber raman û tevgerên xwe, wê jin, ji ali mîrê xwe bête dadkîrin. Lîkolina folklora Kurdan, wê zêtir me pêbawer bike.

Em Stranan Bêjîn, Hevalno!.. Jiyan Çî Xwes

Lî Kurdistanê gelek stran têñ gotin. Jinêñ Kurd dî stranan da xwe dîbinin. Lewra, piraniya stranan, hetta stranêñ şer û ya rasti stranêñ evini yên ku ji dilêñ wan têñ, ji ali jinan têñ gotin. Li vê derê dîdim xuyan ku, lî gor gili û gazinêñ Asûriyan ên ku min naskuriye û şîrêñ wan ên ku min berev kîriye, dî zimanê wan da derbari "durektha"yen şer û dîni tiştek tune. Ev ji tê wê maneyê ku, Kurd romansêñ hissi dîbêjîn (Hawar, hejmar 3) Ji bili epopeyêñ dirêj, ji bili "şer" û "delal"êñ ku çûndîna şer şirovedikin, gelek stranêñ wan ên ku hezar kar

û xebatêni jiyanan rojane tinin ziman hene. "Ber-dolavi"yên dema keçen ciwan xaliyan çedikin û bî teşyan ta dîrêsin, "stranê ser birê", "Stranê havinê" yêni ku keç û xorj ji zozañan vedigerin û bî hevra li hev vedigerin, "Dî-lok"ên ku digel tembûr û bîlûrê têni gotin û "Belite"yêni ku piştî her strani wek vegezin têni strandin û ji listikêni zarokan têni derxistin (Hawar, hej: 53), stranê "lori" bî sadebûn û şirinbûna xwe şaxeke taybeti ya berbiçav pêk tinin (Hawar, hej: 27).

Dî kijan iklimi û hewayi da dibe bila bibe, jin, li her deri eyni ne. Safitiya keçen ciwan, dîlpakiya jinêni bî mîr, xiret û fêdakariya dayikan, rûpelêni pirtûka jiyanan bedewi, bî mijarêni kevn û nû, stranê devê hunermendan ên nexşkiri û harmoniyêni gelek dewlemed û guhêrbar... Eger jinêni Kurd li gor dîlén xwe li her deri bikarîbin bistirêni, hestêni xwe dî stranan da binin ziman, jineke cuda, danberheviya maleki rengin û nexşkiri û didema wê bî tevayı radipêce. Jin haj ji balkêsiya xwe, ji şirinbûn û bedewiyêni xwe hene û kesêni ku bixwazin wana guhdari bikin, ji stranê xwe mehrûm nakin :

BESNA

(Stran. Orijinala stranê di HAWAR, hej. 22'an da heye. Lê ew hejmar me bî dest nextist.)

Jin bî gîzvanokêni xwe yên kej, bî çavêni xwe yên xweşik ên wek berx an ji xezalan, rîveçûnen xwe yên şirin ên wek kewêni mari, werdeken kûvi û marêni çermguhasti dipesinin. Lê wek Hefsadeya ku dixwaze hespê kurapê xwe bî zin û qolanan bixemline û hazır bike, ew ji bo evinêni xwe û dildarêni xwe ji bo hemû tiştî amade ne, ji bo xwefêdakîrinê hazır in:

(Beşek ji strana BESNA)

Yên ku ji hezkirinê û firkandinê hez dikin, wê bixwazin ku li ber hezkiriyêni xwe, xwe bimelisinin û gava bête xwestin danberheva zêde bikin. Yek jê, dixwaze ku di destê dostê xwe da bibe baqeki gul û bî viya qima xwe bine; yên din ku basken wan hebe.

"Ji xêra Xwêdê ra, ez bibiwama dikeki por, hewlahewla nêçirvana

Mînê xwe avêtibana hevrîngekê, ji yên kafirzemanê." (Hawar, hej: 31)

Keçeki ku heft sal e dergisti ye, li hember ke-weke girêdayi ya ku li ber dafikê ketiye kemînê, ji bo şer ji malê dertê û vê stranê dibêje :

"Devê buhurê bî kevir e
Rê pê naeve çiya bîlind e
Delaliyê ber dîlê min!
Tu kewa rîbat i, li gir girêdayi
Ez teyrekê koçeri me, Plûtê ezman
Ez ê nesekinim, li ser Sulêmaniye tim bigerim
Eger delaliya min xeberek qenc an xîrab bî xwe
ra bine,
ez ê wisa bizanîm."

Keça şivan, daxwaziyêni dilê xwe weha rawe dike :

"Ez kareki bê strû bama
di mehêni kanûni û çile da
di rojêni berf û gedûkan da
Çil roj û sê şev
Şivanê min ê biçûk, min ê serê xwe
bikra binê kulavê te."

Wisa ye ku, yeka dîn xwe serdesti hevalêni xwe dibine û bî awayeki vekiri li evina bêxwedi rexne digre :

"Evina wan tenê bî dev û lêva

Ax! evina min evdalê ji nav û dila."

Meriv çawa dikare bifikire ku, di rewseke weha da pêl li hestêni xorteki nexe? Li pêşberi dilbera xwe bî heyrani û bî zewqeki mezîn wê lê mîze bike û wê ji bo dirêjkirina vê demê raweste. Demêni wan ên ku xweş derbas dibin hene. "Stêrka şivanan hêj dûr e." Ji ber ku şiyariya wê li her deri hazır e, wê ramûsanek revoke qebûl bike û hetta ji bo ramûsanek wext bide :

"Gava ezrail ji ezman were xwarê
ji bo ku rihê min bistine
Li gor gunehê min, bila donzdeh dara li min xe
Heqê ramûsandina dildarê min ji min bistine."

Lê xweşik û bedew wisa bî gengazi nakevin dest. Va ye, yeka aqilmend ku li hember dîlan meydan dixweyne, Meyremokê! Ew, xizêma ku jinêni Kurd bî pozê xwe vedikin dibe ba zêrkereki da ku xizêmê bide çekirin. Dî navbera wan da gotûbêjek weha derbas dibe :

"Ya serhoste, min dîvê tu xizêmekê çêki ji dos-tê ra,
Tu ne deyni ser sindana
Tu lînêxi bî çakûçana
Tu bigri bî Hezreti Mewlana
Tu bîkşini bî mijgulê çavâna
Ji bona xelkê delal li pozê xwe yê çîlaki xe,

Rojê êd û daweta, da xîrab nebi cihê ramûsana.

Heft keriyên mih

Heft keriyên pez

Heft zevi

Heft aş

Heft avkêşen biran

Heft tas şirê çivikan

Nakîn bî tişteki."

Lê ev tişt ji bo kışkirina evina dilê wan û hesfîn nezikbûnê têr nake. Qeder, carna pê davê ber lingan û zewaca xewn û xeyalan çê nabe. Wîsa ku, xeyd û çavnebari dibe çavkaniya hesîen tolhildanê :

"Xerabo, xerabo, welleh û billeh tu xerabi
Tu bî galegalê, bî gotina çê nabi...

Xerabo, xerabê dinê, te mika xwe daye bî bîzinê,

Te gula xwe daye bî sosinê!..

Xerabo, dino bila lî te be, lî wi dili,

Lî wê sewdayê, lî wi aqili,

Çewa te dev ji min, kîhêla serê tewla berda

Tuyê bî bergila şixul ê Rîşmiliya û Qîbaliya dîhesili...

Xerabo, dino, min bîhist tu zewici,
Te ji xwe re yek dîxwesti,
Heke ji min çêtir be, bîla lî te helal be lî wi cani,

Yan na ez ê tu nifira lî te nakim, tu dûridest i,

Yan na, Xwedê teala bike, Rebi goşîe canê te bîhele,

lî hewa bîmine komek hesti,

Tu kor bîbi, bîkevi ber vi desti.

Yan na, Xwedê teala bike, Rebi lî canê te keve derdek,

tu nebini tu dermani

Ez ê serê sibehê rabim, bî destê te bigrim,-

Te bikişinim wi cebani."

Lê, tevi van gili û gazin û nifiran ji, ew, xwe bî tena serê xwe his dike û ji bo naletbarandinê berpirsiyari dike stuyê xwe. Ka bala xwe bîdinê, ku çawa xwe eybdar dike :

"Xerabo, xerabo! Xwedê teala bike, Rebi,
heçi ji xerabê min ra bêje "tu xerabo",
Bîla karin û warina zarokê nêr tu carê
di mala wan da nebo!"

Bîla sed olcek genimê sor lî binê beriya Mêrdinê biçine,

lî şûnê bîla qereziwana reş rabo!

Ê mayi, bîla kuliye par û pêrar lê rabo!

Bîla salekê bine ser bênderê, gêre bîke û bîdere,

ew ji jê re bî ka bo,

Kulmek zadê ji wan ra safi nebo!"

Ez dikarim minakê van beşan zêde bikim, lê ev beşen han têri xwe, xwe rawe dikin. Mîn hemû beşan gotin bî gotin, bî tevayı rêz nekir. Kurd di sadebûn û hemû safitiya xwe da, têri xwe, rasti ye. Lê tiştên ku me bîhist, zêdetir ên xweş û kêmqrêj in, yên ku dî latini û Kurdi da bî riheti têr gotin in, lewra me bî guhdaneke bêdeng wan hulbijart.

Çi dibe bîla bîbe, "mîyitiya bêdawi" rola xwe bî cih tîne. Gava fîrsend bîkeve destê jîna Kurd a ciwan kindar, şalûz û çalak e û hetta tu bêji xwedi tiştên baş û xweş e. "Dî pişt her porek kej da, simbêlek sor heye" û lî vê derê, wek hin derên din, "keçen ciwan, deriyêñ hecê ne" (xwezgîniyêñ keçan pîr in). Ya rasti, em dîbêjin ku, ew bî zanebûn, tenê ji dîl gîrêdayî ne.

Ha xiret, em bîzewicin

Hemû kew, wek kewê nêçirvanan ji bo xwendinê nayêñ telandin. Dî gotinêñ pêşîyan da wîsa xweş nêzikayî bî mantiqê tê xistin ku, ji bo jîbirnekirinê bala ciwanan tê kışandan da ku du rûyêñ madalyonê heye û lî ser rojê ji leke heye. Berya ku meriv soz bîde, dîvê meriv ewil bînhîre. Lewra jîn, tenê xwarinê difikirin :

"Jin hene, jinkok ji hene.

Hînek jê ji bo dîlan bîhneka xweş in

Hînek jê melkemot in!.."

Kesên ku dîlteng in, dî bin didema xwe yên xelet-têgîhişti da dikarin bî huner nişan bîdin ku, ne xwedi zirxekê ne. "Hestêñ jinan ên heri xweş, lî ser lêvên wan in. Çaxa devê xwe vedikin, ew dipekin der!.." "Xasûkiya jinan, çiyayê Cûdi aniye hilweşandiye." "Cihêñ ku jîn xera nekîrine, hêj ji bî aqûbet e." "Eger jînek çavlîder be, wey lî halê mîr!.." (Jîn mîra eziz ji dike, rezil ji dike- A.B.) Dîvê em bî lez bêjîm ku, ferqiyêñ weha yên ne xweş, lî ba Kurdan, dî nav kîryarêñ jinan da -yên ku bî eslê xwe Kurd in-winda bûye û bûye wek dilopek av. Dî warê

zewicandinê da, agahdariyên gotinê pêşiyän belgeyên mezin in.

Hilbijartına jina ku meriv pê ra bizewice, giring e. Lê şexsiyeta wê yan ji li gor bedewiya wê, hinek ramanêñ din ji tevli vi kari dibe :

"Lî jinê nenihêre, li malbata wê binihêre." "Xalê wê kifş bike, hêj jinê bine." Lewra, "cani çawa li hespêñ boxe diçin, xwarzi ji li xalêñ xwe diçin." "Xaniyê yeki hebe xalê wi ji heye, meta wi ji." (ango pişta wi heye). Bî rasti ji, xwarzi piştgiriya xalan dikin. Ap, merivêñ xwe li erdê dixin. Ev, jixwe beramberê hev in. Lewra, "xal xwarziya radikin, ap biraziya winda dikin." Hilbijartına heri baş, li ser dotmaman tê kîrin. Lewra, kurap, li ser dotmamê xwedî heqke pêş e. Wîsa pêş e ku, cihêzên wê li gor xwezginiyêñ din këmtir e û hindik be ji, bî qimet e.

"Pêbawer Sam,

Sencer Mam

Jin dotmam."

"Dirûvê şûrê Damas bî apê dikeve wek xencer,

Ji bo ku ji xwe ra bike jin, keça apê."

Lê nişaniya ku qewl li serê hatiye danin an ji zewac, hêj nehatiye bî cih anin. "Bavê keçan mir e." Bî rasti ji, bavê keçan, dibe feleka keça xwe û carna ji evindaran dike bêhêvitiyê û dibe wek gisimek. "Qevdkirina por têr nake." Bê gu-man ciwan qima xwe pê tinin: Aango, "bila dîl bî dîl be, bila tûrê parsê li mil be." Lê ev, karê dê û bavan bî cih nayne. "Ji bo ku meriv bîkeve dîlê jinê, dîvê meriv ya xwedî kisek pere be yan ji topek derew be." Dî derheqa derewan da, li gor minaka jêrin serûberiyek tê kîrin :

"Bîla mîrê min lawi be,

Kirasê min cawi be!

Ku mîrê min kal be

Bîla kirâsê min al be."

Bî kurti, ji sindoqa cihêzên xweşik nayê re-vin. Bî rasti ji, dî sindoqê da diyari yan ji taximêñ zivin, ango cihêzên keçikê hene, ji dergisti ra soz û bext hatiye dayin û dîvê ew cihêz bigihjin bavê. Şik tune ku, ew ê bî rewşa dergistiya xwe ya cîvaki şîkleki bistine. "Dot-mirek, nikare bî cihêzên şîvaneki ra bizewice." Lê dereng be ji, em ê pê bîhisin ku, ew ne li ser vê mijarê ye:

"Ne jina belaş,

Ne xulamê bê meas,

Ne erdê kaş."

Bî gelempéri firehgirtina vê mijarê, bî feyde

ye. Duweroj, wê zehmetiyêñ serdemâ iroyin telafî bike: "Ji xaniyê mezin ra jinek bine, ewqas pere bide, ku jînik du zarok, Mir Sem û Qeretac-din, bine dinê!" Vana (Mir sem û Qeretactin), du qehremanêñ efsaneyâ neteweyi ya Kurd a "Memê Alan" in. Ki naxwaze bibe bavê kurêñ weha?

Neqandin hatiye kîrin, perê qelen hatiye day-in. Gere meriv ji bo kar û barê malê bîlezine: "Ez te dixwazim, tu min dixwazi, ma iman hewce ye?" Tevi viya ji divê meriv strana serketinê zû bêje: "Bûk li ser hespê ye, lê kes nizane malê ki ye." Belki wextê berbûri bî rê dikevin, yek dîbêje "hezkiriyê wi, ji destê wi hatiye stendin" û her weha tê kifşkirin ku bûk hatiye revandin. "daw û dozêñ xwinê" yêñ navbera eşir û malbatan, ji van sedemen pêştir bî tişteki din ra nayêñ girêdan.

Lî ba Kurdan, dawet bê dilan nabe. Ev, wek her gav, kîf û şahiyeke ku lê pir tê gerin. Tu pêwendî yan ji tevgirêdanek dansêñ wan bî folkstrot swing (danseke bî çar tempoyan) û tangoyêñ me û dilanêñ me yêñ modern tune. Ev dansêñ han, ji ali keç û xortan têñ leyistin; keç û xort dikevin milê hev û bî gavan diçin û têñ, xwe dihejinin, bî dengeki xurt û pit stranan dîbêjin. Wîsa dibêjin ku, sindoqa mezin bî bang û bî ritm, bî çakûç tê kutan:

"Tîrsim ez bîmirim dîlo heyran

Lî vê payizê delalo

Lî vê payizê.

Ez ê ramûsim dîlo heyran

Sê bîskê dî qizê hoyo

Sê bîskê qizê delalo

Sê bîskê dî qizê.

Tîrsim ez bîmirim dîlo heyran

Lî vê biharê hoyo!

Lî vê biharê.

Tîrba min çêkin dîlo heyran

Lî bînya darê hoyo

Lî bînya darê delalo

Lî bînya darê.

Ez ramûsim dîlo heyran

Sê bîskê yarê hoyo

Sê bîskê yarê delalo

Sê bîskê yarê. (Hawar, hej: 8)

Edi dawet kuta bûye. Ziyafetêñ xweş hatine dayin, gelek stran hatine gotin û têr hatiye

listin. "Brazava" li devê derê cihê dawetê wezife girtiye. Ew ji bo êlankırına kutabûna dawetê çend dest sileh ji berdaye û herkes vegeiyaye malên xwe. Diya brazava ya ku bî bûkê ra ye, "Berbûri", dotûra rojê wek ku dî incilê da ji tê xuyan, wê "içareta qizantiyê (bakireti)" nişani dostan û kesên malê bide. Demek şunda rola jînîkê (diya brazava) qediyaye. Êdi zewicandiyê nû lî mala xwe bî cih bûne. Jiy-an, wek ku gotinê pêşîyan rawe dîke, bê xir û cir ji nû va dest pê dîke. "Jîn stûna malê ye, jîna esil destgirti ye; jîna xîrab, ne tê kuştin ne tê berdan; ji kel e, mîr tê da hevsi; mîr çem e, jîn gol e."

Jîn, bî gelempéri, lî gor mîrê xwe zêtür parêziyê dîke. Ew, ji vir şunda dî mirinê da ji di saxitiyê da ji bî hevra ne.

"Jîn û mîr

Tevir û bêr."

Êdi tevir û bêrê ku gorê dikole û gorvedanê sembolize dîke, dikare wan ji hev veqetine... Herweha, bêguman ew ê ji van demên xweş berjewendiyê bistinîn. "Nîrina çavan, neynîka dilan e." Û wê mîr bikaribe deng lî jîna xwe bike û bêje: "Mîn ji bo kaniyeki, ji çiyayeki hez kîr." Tevi viya ji, wê jîn ji bo bîrinê lî benda wi nemine. Dêlva herkesi da: "Jîneka dîlpak, wek bajareki bî qimet e; mîreki dîlpak, tenê bî qasi kareki bî qimet e." Eger mîr lî kîlerê xwe veşêre û jîn lî hember xeteran bikeve parastinê, ev qet ne tişteki normal e. Çî dîbe bîla bîbe, "dik ji bo rojeki, mîrisik ji bo her roj lazîm e", "dara biyê bî serê xwe (ya ku qet vînakeve) wek mîreki ku dî binê emrê jînê da be." Dîvî carna merîv bî bir bîne ku, "jîn kar û barê malê bî duayan bî cih nayne." Lî ali dîn riya heri baş a ku merîv xwe ji şer û nako-kiyan bîparêze û dûr bisekine ew e, ku merîv lî hember malbata keçikê bî azadi derê meydanê. Lewra, "lî dînyayê sê din (kêmaqlî) hene: Yê ku dî kaşan da cixare vîdixe, yê ku konê xwe lî kîleka xezûrê xwe datine û yê ku bî serê xwe digere."

Lê kîfxweşi û şahi, heta welidandîna zarok e. Ji ber vê yekê gelo dî emreki ciwan da zewicin tişteki rast e? "Eger tu dîxwazi dî dema heri baş da ji hebûna zarokan berjewendiyê bistini zû bizewice." Ji bo viya ji, formul ev e:

"Bî emrê Xwedê, pişti 9 meh, 9 roj, 9 saeti

Wê Xwedayê mezîn, warê min hêşin bike." yan ji"

"Wê Xwedê zarokek bide jînîkê û ew ê sê dîlopêñ nûr bikeve ser rûyê wê." (Memê Alan,

Lescot).

Lewra bî rasti ji "zarok, fêkiyên malê ne."

"Mala zarok tê de,

Şeytan naçe tê de."

Bî rasti ji, ji bo dê û bavek bî ser dergûşê da xwarbûn, qefaltına kena yekem, hezkırına yekem, maçkırına yekem, peyva yekem çi xweş e! Bav ji ber xwe va, lî ber qeraxeki tifîkê qelûna xwe ya dîrêj vîdixe, çavên girtî vedike û bî bê-dengi, guhdariya "lori"ya jîna xwe ya ciwan dîke, guhdariya dixewrakırına pêçekê dîke :

"Binve xweşîya dîl û du çavan,

Dadê ji te re her ro nîgehban

Da zû tu mezîn bîbi Bedîr-Xan

Binve kezeba min binve lo, lo!

Hışyar mebe, niha ne qenc e,

Mehdik ji te re bizane qenc e

Bê xew mebe paşıya wê denc e

Binve kezeba min binve lo, lo!

Xweşhal i weki kevok û berxan,

Fekrandîna te melek ji heyran.

Pak e neseba te dadê qurban,

Binve kezeba min binve lo, lo!

Dewra felekê lî ser me kin e,

Bextê me reş e, kezeb bîrin e

Mesken ji me re niha nîvin e

Binve kezeba min binve lo, lo!

Ne mal û ne saxi û ne rehet,

Talan kîrine hemi ji mihnît;

Dijwar e gelek belayê xurbet

Binve kezeba min binve lo, lo!

Çerxa felekê weki nesim e

Ho nabe Xwedê gelek rehim e

Roja xweşîyê dîbit kerim e

Binve kezeba min binve lo, lo!

Hewqas tu mebêje ev çi hal e,

Bê sebr mebe welê menale;

Ewn û kerema Xwedê heval e

Binve kezeba min binve lo, lo!

(Hawar, hej: 5-Emin Ali Bedîrxan, sparte 1906)

Gelo bî viya, tevi vizina ba û barana derva ji, ew xwe wek ku lî mala xwe be his nake?

"Mala pirê

Xweşîr e ji mala mirê."

B1 wi awayê ku, d1 çarçeveya dostaniyek nêz da, mér, wê d1 demsalên cuda da pîrsa heri tiştên xweş ji jina xwe bîke û wê jin ji, bêyi ku bîkeve tîrsa derewkariyê, bersiva mérê xwe bide:

"Bîharê, pez
Payizê, rez
Zivistanê, ez."

Em xwe ji nezerê biparêzin!

Êh, nexwe hûnê niha b1 viya bawer bîkun? Ev jinêñ pir bedew û rînd, kêmâniyeke xwe ya bîçük hene : Ew d1 pêngaveke bilind da xwedi baweriyêñ batini ne û wek ku niviskarê Domini-niki ji dîbêje, d1 vi wari da gelek famekor in, angò pir nezan in.

"Êşek seriyan, çînginek guhan, veleyistina çavan, axinek kûr, l1 dû hev piyikin wek nişana felaketek hatiye şirovekîrin. Baweriya wan ew e ku, ev tiştên han l1 hember qedera wan ê b1 reş dîqewimîn, ya merivek l1 naletkirina wan dîgere, ya dîranê xwe l1 wan qîç dike yan ji l1 hember wan çavreşiyê dike. J1 bo dûrkîrin û pûckirina vi ramanê, jin û xîzmetkarêñ malê hanhanka l1 hev dîcîvin. Yek ji wan, tarek datine ser serê jinika nexweş a ku xwe ne baş dîbine; yeka din ji d1 destê çepê da tasek avê û d1 destê rastê da ji qaşo di tasekê da gulleya helandi, datine ser serê nexweş."

Eyni niviskar raweya xwe weha dîdomine :

"Rojeki l1 Amedê, l1 qesra Cemile Xanîma jina mir qewraşek ji bo destşûştinê ji min ra av ani. Min jê ra got, "desten min paqij in." Bersiva wê, "bişo maqûlê min, lewra tê dermaneki hazır biki." Min bawer kîr û b1 gotina wê kîr. Ez difikirim gelo ez ê kijan dermani çêkim, hingê Cemile Xanîm, "te ev derman berê ji çêkiriye", got. Ez têgîhiştum ku, ev av, wê ji bo jineka ku zarokêñ wê çenâbin bête b1 kar anin. Jin wîsa pê bawer in ku, qabiliyetekê weha di xwêdana mîvanan da ye." (P.Campanile, "Storia della regione del Kurdistan (Tarixa Navçeya Kurdistan), Napoli, 1818, rûp: 87).

Ez, deh sal berê dîgel Aşitiyanan ji Zozan dihatim xwarê. D1 eyni navçeyê da, l1 ba mezinê gundê Bibe, ku ji Amediyayê ne dûr e,bihna xwe dîda. J1 min ra xwarin hazır kîrin. Ü gava min loqeki nan jêkîr ku bavêm devê xwe, jinika qewraş xwe avêt ser nanê destê min û ji min ra got, "b1 destûra te." Min nan dirêji wê

kîr û ketim meraqa vi hereketê wê. Wê weha bersiv da: "Kureki min ê nexweş heye û agirê wi gelek bilind e. Ev nan, wê wi baş bike!..". Ez, pişti saeteki ji malê derketim û çûm, lê tu car nebû nîsibê min ku ez bizanibûm, ka ew kurikê nexweş b1 nanê destê min baş bû yan na..

Wek van jinan, hemû jinêñ Kurd xwe ji neze-re dîparêzin. Lî bi gelemperi, berevajiyê baweriyêñ rojava, ew l1 çavêñ şin ên peşkreş mîze nakin. Gotineki pêşîyan weha dîbêje : "Çavêñ şin, peşkreş in."

Herweha, lî jêrê çend minakêñ ku min ji baweriyêñ batini yên hêla Duhok berev kiriye ev in :

* L1 ba nîvina jinêñ çili teşî nayê rîstîn an ji kar nayê kîrin.

* Jineka çili, heta çilê wê neqede naçe ba jineka çili ya din. J1 ber ku ya din vê seredanê wek peşkreşî qebûl dike û b1 baldayin hereket dike: "Wê, pêli min kîr" dîbêje.

* Eger du jinêñ çili ji nişkava di rîyekî da rasti hev bîn, dîvî derziyêñ xwe yên dirûtinê b1 hev biguhurînin.

Azlûkîrin û pêzanina koka çespandinêñ weha gelek dijwar e.

Gava meriv dertê gerê, ji bo paqikirina hemû eşayêñ malê zordayin tune. Serda ji, eger kesê ku dertê gerê mîr be, "b1 riya zewacê yan ji mervatiya xwinê hemû jinêñ xisim heta sê rojan ji malêñ xwe dernayêñ der, xwe naşon û ji bo şûştina dest û rûyêñ xwe sabûnê b1 kar naynîn. Eger kesê ku dertê gerê jin be, mîrêñ malbatê tenê ji bo rojek xwe dîjînîn." (P.Campanile, rûp: 88-89)

D1 jîyana Kurdan da, kevneşopiyek gelek ecêb heye ku, hêj ji, jin û mîr b1 hezkirineke kûr û hevgirêdanekî hîşk vê adetê dîdomînîn. "Eger jîna xwediyê malê kareki bîke (wek çêkiriye xali, nexş û wd) û wê hingê mîrê wê bîmre, karê destan d1 cih da tê berdan û ji bo malbatê b1 riya yeki xerib diyari têtê çêkîrin, lê d1 bihayê qînetî mirî da."

Dema Gernasiya Jînan

Jîna Kurd a ciwan, çawa b1 dîl û can xwe dîde kar û barêñ malê, evina xwe vedîşêre û d1 balkışandinê da hosta ye, d1 her rewşî da b1 kîf e û destkariyê ra jêhati ye, her wîsa ji qalikê teng ê eşirê û malbatê ji dertê û pirsgirêkîn ji xwe zêdetir (d1 maneya têgîhiştin û çare-serkîrinê da) ji b1 fam û firaseta xwe têdigîhîje.

Serhildanê li daraketi yan ji li daraneketi da
digel jar û feqiran, dî ciwanê nûgîhişti da ji
welatheziyek nediti derdixe meydanê.

Rîndê û Zizê, dî Serhilda Şêx Seid da bavê
xwe Bengi Axa wînda dikin, ango Bengi Axa li
Diyarbekir tê kuştin. Herdu keçen Bengi Axa
tevi sermaya ku piyan bêcan dihişt û agirê ku
êşkence dîda wan, li ba yeki Türk bê navbir xali
çê dikin da ku mesrefa dibistana birayê xwe
Gefo bîdin. (Hawar, hej: 4, Celadet A. Bedîr-
xan)

Gelo ji bo Perixana qehreman a serdema xwe
wê çi bê gotin? Bavê wê Mûsa Begê Kisani, dî
1907'an da komiteyek nehêni ya berxwedanê
saz kîribû. Ji ber ku kurê Mûsa Beg tune bû, wi,
keça xwe Perixanê, wê çaxê 30 sali bû, li gor
ramanê xwe perwerde kîr. Perixanê, hemû
şiretên bavê xwe bê kîmani bî cih dîani. Wê,
destana "Mem û Zin'a Ahmedê Xani ye nete-
weyi jiber kîribû. Bî nexşeyeke Kurdistanê, ku
li serê gund û bajaren Kurdistanê hatibûn
kîfşîrin, diwarê oda xwe xemilandibû. Lîkolin
li ser tarixa Kurdan kîribû û serpêhatiyêن wan
en qehremani berev kîribû. Lewra, rojeki, gundê
wan çarnikal tê girtin. Û bavê wê dîbin. Ew,
tenê bî gotina "tolhildanê" qima xwe tine. Dî
navberê da şes sal derbas dibe. Keçika bîcûk,
mezin dibe û keçeka ciwanî bedew jê dîterê. Lî
ew, xwedi dileki pak û evindagirti bû û dîlê
hevalêن xwe venedileyistand. Rojekê cejna ne-
teweyi ya Tîrkan dîhate piroz kîrin. Dî bin ser-
okatiya wali da, wê hêzeke esekerî ya merasimê
li meydanê hazır be. Lî ser navê xelkê Perixan,
wezife dîgre ser xwe da ku çîçek pêşkêsi wali
bike. Perixanê dî nav baqê çîçekan da bombe-
yek bî cih dîke. Merivêن çekdar pê ra hevrîti
dîkin heta ku yêñ din li dora qışlê gera xwe
temam bîkin. Keçika rûken (Perixan), ji bo
pêşkêskirîna baqê çîçekan berbi wali dîce. Tam
wextê ku pê dihîsin û dixwazin Perixanê bigrin,
ew bî hemû qewet û hêza xwe bombeyê davêja
niveka meydanê. Bombe dîteqe. Ev bûyer,
işareta destpêkirîne ye. Ji her ali çek dîteqin.
Esker berbi rast û çepê direvin, belav dibin.
Raperinvan, dora cihê wali dîgrin û ala xwe li
wê derê dîçikin. Çend saet şunda têñ (esker)
cihê bûyerê. Lî wê derê tenê komikek ax û kevir
dikeve pêş çavan. Laşê Perixanê, ku desten wê
hêj dî qırıka wali da hişk-şîdandi bû, ji nav
komika ax û keviran derdixin. (Hawar, hej: 37)

Jîmîn bî mîr, cesareta mîrane zû bî zû li hê-

viya keçen ciwan nahêlin. Lî hêla Pijder, berya
Şerê Mezin, navê du pêşewayêñ jîn ên balkêş tê
biranin. Ji eşira Kafarûsi Pûra Helim û ji eşira
Xşvan Şah Nêrgiz. "Piştî ku mîrên wan ji ali
eskerêñ Türk têñ kuştinê, ew serê xwe girê didin
û bî salan li hember xanedaniya Osmani şer
dîkin.

Piştî mirîna Ahmed Axayê serokeşirê Rema-
niyan, Perixaneka dîn, ji ber bîçûkbûna kurê
xwe Emin, serokatiya eşirê dîke.

Ev Perixana han, digel bedewiyê, bî cesaret û
jîritiya xwe ji li hember rîvebiriya nawendi, ji
mîrê bêtir bî ser û can têkoşin dîke. Lî hespan
sîwar dibe, çekan girê dîde û stranê qehremani
dibêje û digel "dengbêjan" pêşengiya şervanan
dîke. Nav û dengê wê, ji yê Ahmed Axa zêdetir
belav dibe û zarokêñ wê bî navê "kurêñ Perixa-
nê" têñ nasin. Tu kes bî navê Emin bangi kurê
wê nake û ew (Emin) bî xwe ji, ji navê "Eminê
Perixanê" û bangkırîneke weha aciz dibe.

Zarokêñ keç ên hevçaxê Perixanê û yêñ ku dî
nav eşira ciran a Remaniyan da hatibûn dînê, vê
navê distendin.

Ey tişt, ango dî nav eşirê da serokatiya
jinîka jîhatî, pîr caran tê ditin. Berbi 1908'an,
Fatmaya ku hêj 38 sali bû, qedera eşira Ezdinan
kîribû desten xwe. Ew, bî maneya "dotmir" bî
navê "Kralitsa" dîhate nav kîrin.

Lê ji van serokeşirêñ jîn, a heri naskiri,
bêşik Adile Xatûn e -dî 1924'an da mîr-. Jîna
Osman Paşa yê bêkêr, li Helebçeyê 15 sal dî
şûna mîrê xwe da rîvebiriya dewleta Caf a bîçûk
kîr. Navê "Bahâdir Xan", "Dotmira qehremanan
lê tê danin.

Zêdekirîna minakêñ weha ne hewce ye. Ji
devê binbaşî Noel ê Ingîliz, ku dî serdema şer
da bî hêzêñ Ingîliz ra li dorhêla Mûsîlê maye,
serpêhatiyekî weha tê gotin: "Dî navbera du
şîrikan da, ku li ser erdeki xwedi hukim bûn,
nakoki hebû. Tevi xurti û qeweta wan ji, li wê
derê tevlîhevi û teşqe dom dikir. Pê tê hisin
ku serokatiya her şûnewareki dî bin destê jînekê
da ye, ji wê gavê pêda, bî bêdengi, bê tawiz hu-
kumdariya wê derê dikin. Xelk, li pêşîya jînekê
tu dernaxe û vê rewşê dikin wek semboleke
şerefê

Nezaketa Mêran, enerjiya jinan: du xusû-
siyeten xweşik ên Kurdan e.

Heta ku jîn gernas bin, gel namire!..

MEM Û ZIN

Wek radyo-dramatik -1

Ev şêweyê radyo-dramatik yê destana "Mem û Zin"ê, ji pirtûka "Mem û Zin"ê, ya ku dî 1980 'an da li Finlandiyê bi zimanê swêdi derçûye, hatiye wergirtin. Çapa swêdi ji du beşan pêktê. Beşê pêşin çiroka Mem û Zin'ê ye. (Ji ingilizi hatiye wergerandin, ku orijinalê wê ji bi destê Heciyê CINDÎ hatiye berhevkirin û dî 1962 'an da li Moskovayê hatiye çapkirin.) Beşê duwemin ji ev radyo-dramatik e, ku li ser vi variyantê destanê hatiye çêkirin.

ROBERT ALFTON

MEM Û ZIN

Destana Kurdi ya netewi.
Radyodramatizekirin ji aliyê
Robert ALFTON

ROLÊN DRAMATÊ

MEM: Zirkurê Alan Paşa

ZIN: Dora Mir Seydin

QISEDAR (MÊR): QM

QISEDAR (JIN): QJ

HESP

QERETAJDIN

ERFAN

ÇEKAN (Çeko)

BEKIR (Beko)

DOTA BEKO

(Lî bazara bajareki piçûk, dî navbera Derya Hezarê û Xelica Farisi da. Dengê qelebalixê û hire-hira hespan. Dengbêjên vi bajari, her yeki lî tembûra xwe dixe û hewl dide ku ji gışkan bêtir ew guhdaran lî dora xwe bîcivine.)

QM:

Lî çirokeke xweş guhdar bin.

QJ:

Belê, çirokeke zehf xweş, dî van sal û zemânêne ne xweş da.

QM

Belê, tenê em dikarin ji we ra çiroka rastekin ya Mem û Zinê bêjin.

QJ

Tenê em dikarin geli guhdarêñeziz, ji we ra rava bikin, gelo çîma li ser gora Mem û Zinê du gulêñ spehi û bîhnxweş hêşin dîbin.

QM

Gelo çîra struyeki tûj ê bêbext, dî navbera herdu gulan da hêşin dîbe û nahêle ew

bîgihijine hevdu.

QJ

Rind guhdari bikin em ê ji we ra behsa evina Memê mîrxas û Zina dotmir bikin.

QM

Heta nîha tu keseki ev çiroka xweş, ji Kurdistanâ beyani û delal, ji we ra bî awaki xweşik negotiye, bî qasi ku em ê nîha ji we ra bêjin.

(Dengê qelebalixê kêm dîbe. Çirokbêj bî haletêñ sazbendiyê, yêñ cuda-cuda bî meqam û awazêñ xweş dest bî pêşkêşkirina çiroka xwe dîkin.)

QJ

Memê bî vi awayi hate dinê:

QM

Diya wi digel sê sıwarêñ hov derketibû çolê. Wê li qeraxê deryaki çenga xwe tiji av kir û vexwar. Çend dîlop ji ava behrê niquti ser dilê wê. Bi zar (hemle) ma û dî devê xwe ra welidi û Memê hate dinê.

QJ

Ey Xweda, ev ci bû hate serê min? Ez ê nîha ci bikim? Ez ji mala xwe hatime dûrxistin. Gerek ez nîha keçekte ezeb bûma û li Ardawêdê miqate bûma, ew ciyê piroz nêziki bajare Mixruzemin. Xelk wê ji min ra ci bêje? Çawa bû ku ev yek hate serê min?! Ez ê xwe bavêjime behrê.

QM

Lawkê delal wek şemdaneki dicirüsi li milê diya xwe. Wîsa dicirüsi, mina stérkeke ezmana ku ji ciyê xwe dişiqte.

QJ

Dî dawiyê da lawîk xîste nava pêçekê. Ew bî dilovani pêça, hîlda û bir kîleka deryayê. Lî wê derê dani.

QM û QJ

Mixruzemin bajareki reş û tari ye,

wisa reş e ku çavé mirov dîtîrsine.
Lı navenda bajér heye koşka Alan Paşa.
Rojekê ji boy kêté
 Alan paşa rabû çû qeraxê avê,
 û dengê girina lawkê piçûk bîhist.
QM
 Xwedayo, ey Xwedayê min,
 ez êdi kalemêrek im, bê qidûm im,
 lê te ji min ra şandiye ev zaroka han.
QJ
 Bî dilovani zarok da hembêza xwe
 û hûlda bire mala xwe.
QM
 Binîhîrin lî afrandîna Xwedê,
 Yadigara Xwedayê rehmê.
QJ
 Cihan heye bî sûr û sinorên xwe
 Lê lawîk bû kurê Alan Paşa.
QM
 Belê, bî rasti zarok gîhişt, mezin bû û bû qasi
 çiyaki.
QM û QJ
 De bêjin, ma ne ecêbeke gîran e ev cihan?
 Ku ewqas pîr kes lê dibin mîvan.
QJ
 Niha guh bîdîn ser gotin û qiseyên Zinê.
ZIN
 Ez Zin im, dota Mir Seydin,
 dotmama Mir Sêvdin.
Ez dijim
 lî bajarê bavê xwe,
 Cizira Botan ya bî nav û deng.
Ez Zin im,
 bûka Qeretajdin
 û destgirtiya Çeko.
Çil cariyêñ min hene.
Ez Zin im,
 dota Mir Seydin
 lî bajarê Cizira Botan.
QJ
 Rojekê Zinê da pêşıya çil cariyêñ xwe û der-
 ket seyrangê û çû nav xas-baxçê nependi
 (veşarti).
ZIN
 Geli cariyan. Ez westiyayı me. Ez ê lî vir bîhna
 we bîstinim û bistekê ji xwe ra razêm. Hûn
 herine malê.
QJ
 Zinê lî wir raket û kete xewê. Lî wi ciyê ku
 Zinê xwe lê dîrêj kîribû, dareke bîlind hebû.
 Sê kevotk hatin lî ser guliyêñ darê veniştin.
QM
 Esasen ev kevotk sihêrkiri bûn. Du heb keçen

cîwan û ya dîn ji diya wan bû. Dema çavêñ
 keçikan bî Zinê ket, şaş û matmayi man û ji
 diya xwe pîrs kîrin?
QJ
 Bêje dayê, dî hemû dînyayê da ji Zinê rîndtir,
 bedewtir keseki dîn heye?
QM
 Zarokno, Memê Alan heye lî bajarê
 Mixruzemin. Zin bî qasi nivê Memê spehi
 nine.
QJ
 Wê çaxê divê em derhal Zinê bîherin ba
 Memê û paşê bi şunda binin.
QM û QJ
 Ferman bike Ey Xuda!
 Qilixeki kevotkan bîşine xwarê.
 Em tenê sê kevotk in,
 bî vê Zina han va bila em bibin çar.
QJ
 Ü Xwedê emîr kîr.
 Qilixeki kevotkan ji ezmana hate xwarê,
 û hersê kevotkêñ sihêrkiri bûne çar.
QM
 Memê lî birca xwe ya spi,
 dî xewa gîran da radîza
 û tu keseki lî wir nedîwêribû biçûya oda wi.
QJ
 Şev ji nivê şevê derbas dîbe.
 Memê Alan dî xewa şîrin da ye-
 Wê çawa bî hatîna Zinê hayedar be?
QM û QJ
 Van herçar rîndêñ sihêrkiri
 Riya salekê dî saetekê da hildan.
 Tîştê ku bîqewime, wê bîqewime,
 û herçar kevotkan fîrdan û çûn.
 Xwe gîhandin bîhuştê,
 lî ser eywana Memê veniştin.
QJ
 Wê çaxê wan Zinê ji dîlqê kevotkan derxistin,
 mûma ber serê Memê vemîrandin,
 Zin xîstîn nav ciyê Memê.
MEM
 (Bî xwe ji xwe ra) Kê mûma ber serê min
 vemîrand? Gelo ez xewn dibinim ku ez hisîyar
 im? Ev çi ye wisa germ û gîran e lî ser milê
 min? Na-hebe tune be ev qizeke sihêrkiri ye.
 Ya ku ji hemûyan spehitir e. (Bî dengeki
 bîlind.) Ez bî wi Xudayê yekane sond dîxwim
 ku tu periyeke sihêrkiri ya bîhuştê yi. Çimki
 hetâ niha tu keseki newêribûye ku nêziki vi
 ciyi bîbe.
ZIN
 (Bî xwe ji xwe ra) Ya Xwedayê min, ez lî ku

me? Ev ne ew nivin e, ya ku ez tê da razabûm. Gelo ez xewn dîbinim ku ez hîşiyar im? Ev çi xorkeki spehi ye. Gelo ev kê ye? Na ne mumkun e. Wi çawa wêribûye ku bê û bikeve bin lihêfa mîn. (Bî dengeki bilind.) De were ser hîşê xwe, ez bî navê Zina çeleng û delal sond dixwîm ku heta iro tu keseki ev ciyê mîn ê xwes raçav nekiriye.

MEM

(Bî xwe ji xwe ra.) Ez xewneke xwes dîbinim. Çi bedew e ev Zina han, mina horiyeke bîhuştê. Dîvê ez bizanibim gelo ew li bajareki ser rûyê erdê diji yan di nav ewrêñ ezmanan da diji. (Bî dengeki bilind.) Ka ji mîn ra bêje, dî bajarê bavê te da çend minare hene?

ZIN

(Bî xwe ji xwe ra.) Ev xorke han çi xorkeki bedew e, qet emsal û minakê wi tune li ser rûyê erdê. Dîvê ez bizanibim, gelo ew li ser rûyê erdê diji, yan di nav ewran da li ezmanan diji. (Bî dengeki bilind.) Ez bî wi Xudayê mezin sond dixwîm ku bavê mîn geleki bî rûmet û serdest e, lewra dî bajarê wi da hene şestûşes minare.

MEM

(Bî xwe ji xwe ra.) Lîbelê ev behsa şehreki ser rûyê erdê dîke. Dîbe ku ev qet xewn ji nebe. (Bî dengeki bilind.) De ka temâse bîke tu Zina qeşeng, li bajarê bavê mîn û sêsed şestûşes minarêni wi.

ZIN

Vaye ez dîbinim ku, teyr û tûyên beriyê û stêrkên ezmanan têñ jimartîn, lê ne minareyên bajarê bavê te.

MEM

Ez ê van gişkan bîdime te, heke tu li vir bimini û êdi paşa venegeri, keça delal Zinê.

ZIN

Memê, tu dizani yêñ ku mîn hildane anine vir, wê disa mîn şunda vegeerin û bibine mala bavê mîn. Lewma ez dixwazîm em gustilêñ xwe bî hev biguhurîn. Kevneşopi û adetêñ me dîbêjîn ku gereke mîr ji xwe ra li jînê bigere, ne ku jîn li mîran bigere.

MEM

Zina delal ka bîde mîn gustila xwe, û bigre vê gustila mîn. (Deng, effekt.)

QJ

Kevotkan li ser Memê xew belav kirin û Zinê xistin drûvê kevotkan. Perwaz dan û çûn. Wan Zinê ji kêderê anibûn disa birine wêderê.

QM

Wê sîbehê Memê ji xew ranebû, û li bajêr gişkan wîsa dîzanibûn ku Memê nexweşê nav nîvinan ê mîrinê ye. Lê bavê wi Alan Paşa got: Memê nexweş nine. Ya bengi bûye yan ji dixwaze bîzewice, lê şerm dîke ku bêje.

QJ

Alan paşa dazanek belav kîr li bajarê xwe, Mixruzemina bî nav û deng.

QM û QJ

Hemû jînêni bî mîr û yêñ ezep, mîr û xortêñ cîwan, wê bîn dî koşka paşê da, cejn û şahîyeke mezîn li dar xîn, bîleyizîn, govendê bîgerînin û dema xwe xwes bikin. Memê mîn destê xwe dayne ser milê kijan jînê, û ew jîn kê dîbe bîla be, ez ê wê ji kurê xwe ra bixwazîm.

QM

Pîstra wi deh xort şandîn ku Memê ji xew hîşiyar bikin, û wi ji bo vê şahîyê amade bikin.

QJ

Van deh xortan, textê Memê wîsa pit hejandin ku Memê ji ser nîvinan kete xwarê û hîşiyar bû.

QM

Wê çaxê Memê hîşiyar bû û rabû ser xwe. Xortan jêra av anin.

QJ

Xortan destmalek danê û wi dest û rûyê xwe ziwa kîr.

QM

Wê gavê çavê wi bî gustila Zinê ket.

MEM

Ne ji xwe ew tiştêñ ku mîn işev ditin, ne xewn e, çimki vaye gustila Zinê dî tiliya mîn da ye. Wê çaxê gerek e gustila mîn ji dî tiliya wê da be.

QM

Dûra wi ji xortan ra got ku wi bî tenê bîhêlin.

MEM

Zinê dîlê mîn bî xwe ra bir. Dî tevaya Mixruzemîn da, tu keseki ku bî qasi nîvê siya Zinê ji hêjayî dildariyê be tune.

QM

Memê rabû çû xezina bavê xwe, tûreki mezîn tiji zêr û muc ewher kîr. Paşê çû cem Zincêker.

MEM

Hostayê Zincêker, ez bedêlê da çend zêran bîdime te ku ji hespê mîn ra zineki wîsa çê biki ku heta iro zineki wek wi tu keseki çê nekîribe.

(Dûmahik heye)

Werterandun jî swedî X. Lezgî III

STRANÊN SERHILDANA AGIRI

2

Berevkar: A. BAZIDI

KIRÊ TENDÜREKÊ (MİRÊ MIN)

Mirê min, were mirê min, mirê min
Le bavê Mihemed de ez bî qurban
Seglavê hêdi bajo, hicûmê topê ye, wezirê
min
ê welatê xerib e rom xayin e
tê da tunne gelo beledê min.

Were mirê min, sibe ye
Bî diyari Kîrê Tendürekê diketim
Jî kula dilê min ra bê tê, min kin e
Qazi Mistê sê denga dikir gazi
go: Lo lo Ferzende birano
le gulle vi gawir Sari atêş e
Lî ser me da tê lawo wile wil e
Şemla dî sibê ra dî bin bavê min da
şexûlê lêketi, de rabû
tengê nagre wê bû qendlî e
Min jî te ra nego, najo ser gulla sûstem e
gullek bê namûs e, roma rezil e, mirê min.

Were mirê min, sibe ye
Bî diyari Kîrê Tendürekê diketim
Jî kula dilê min ra bêje,
gelo şefeqa sibê li melê ra
berxê mala Omer û conturka devê madolya
min evdalê, min rebenê hev girê da.
Bî diyari Korta Milazgirê diketim
Bila gaziya here bê, bî xwedê ra
Tahir û Fehim birindar in
şerê qlûçgedûkê, di wexta Ûris û Romê da
Fetulah Beg man li cemalê Seximê minê
di bertyê da,
Xalit Üsiv mane istıqlala Diyarbekirê
min rebenê bî darê da,
Lî min rebenê Silêmanê Ehmed isal jî pê
ra
mane, kavilkâ İranê dî sûrê da,
min rebenê Rizayê Sor mane axa Mûşê da,
keseki xudanê xêra tunne
cabeki bide wêrana Mûşê ji Riza ra

hela bê Rizango min!
Serê xwe rake jor xwe Mûşê ra
isal heft salê me temam bû
Kerem û Ferzende pey te rabûn,
şewiti nagire Romê ra mirê min.

Were mirê min sibe ye
Bî diyari Kîrê Tendürekê diketim
Jî êvara xwedê da, nade min eman e
Qazi Mistê sê denga dikir gazi
go: Lo lo Ferzende birano!
EZ ketime ber bextê kura
Silêmanê Ehmed mane hewşa Emirtûmanê
jî êvara xwedê da lî ser me da
girtiye eskerê firqa Wanê
bavê mino, jî ezrail ra bêje
bila bî nişan bavêje,
birayê te ra vegerine, extê cebürxanê.
Qazi Mistê sê denga dikir gazi,
li qumandarê Wanê, digot:
La lawo, min kozikê dê bavê we gano,
we gi, eskerê min miqabili eskerê we hebûya
minê bî şefeqa sibê ra
jî te bistan da wilayeta Erzurimê,
pê da qebûl nedikir, bışelixâ Ezirganê, mirê
min.

BIHURÊ MÛRADÊ

(Dengbêj: Şakiro)

Axao, axao

Sibe ye şerekê li me çêbû, qalekê li me qewimi
Heylo lo miro, li Bana xopan, jî xwe ra vê
sibengê çiya bî çiya
Sibe ye min di(t) dûki gawir mendoli
Lî ser kozika Xalis Begê, bavê Xanûmê,
Berxê mala Sêrxûn, gula qaçaxa, jî êvar da li hev
geriya.
Xalis Begê bî sê denga ban dikiri, go
Ehmedo lo lawo tu çêbe çê bixebebî
Eskerê vi zalimi, cumhûra teze ye,
Bihurê Mûradê li me biriye
Tu dêna xwe bidê,
İro jî êvar da koka mîr û egita li me qeliya.

Bê axo, li minê, li minê, li minê, li minê hey wayê,
 Agirê kulê di mala Roma virek da dayê,
 Çawa bî zora darê tifingê dajo ser kozika
 bavê Xanîmê,
 Gula qaçaxa neminum li ser qedayê.

Axo, axo
 Herê maqûlo sibe ye, şerekê li me çebû.
 Qalekê li me qewimi, heylo lo miro li Bana
 xopan li qûna çiyê
 sibe ye gule têne Xalis Begê,
 Bavê Xanîmê, gula qaçaxa; fenani tavyî.
 Keseki xudani xêra tunine cabê bide
 Ebdulmecit Begê li menfiyê
 Bibê mala te xirab be, derbekê bî dest ber-
 dane
 Bedena Xalis Begê, berxê mala Sêrxûn,
 Bavê Xanîmê, gula xaçaxa.
 Bîrina vi xweşmêri kûr xeder e, li destê rastê
 li tiliyê.

Bê axo, li minê, li minê, li minê, li minê hey
 wayê,
 Agirê kulê di mala Roma virek da dayê,
 Çawa bî zora darê tifingê dajo ser kozika
 bavê Xanîmê,
 Gula qaçaxa neminim li ser qedayê.

WAY SALÊ *(Zargotuna Kurda , cild I)*

Way salê way salê, way salê, way salê hêsir,
 hêsir, hêsir
 Ez hêsir û feqirê Geliyê Zila me, hey bavo,
 hey bavo,
 Anê diya heft kura bû, her heft kurê wêna
 roja şerê Geliyê Zila hatine kuştin,
 Anê serê xwe serqot kir, destê xwe rûbari
 Xwedê kir,
 Hezar xweziya xwe bî fermaña fila tanî,
 Hêsir im, hêsir im, hêsir im,
 Ez hêsir û feqirê Geliyê Zila me, hey bavo,
 hey bavo.

Way salê, way salê, way salê, way salê, way
 salê,
 Ez dîmirim herçar salê muhaciriyyê,
 Lê, lê anê, mala me muhacir bûne çardê vê
 sibatê,
 Konê Ûsivê Kor Husêñ Paşa danine li ber
 Sipanê, bîniya vê Xelatê,
 Hikumeta Romê bavê bavê eşira, eşira lawê
 Taho
 Geleki giran e, jî xwar û jor va hatê,
 Heywax, heywax, heywax, heywax,

heywax,
 Keseki xudanê xêra nemaye cewabekê
 bisine Êyranê ji Memê ra
 Bibê Memê te ocaxkoro warê te dînyayê
 windayo
 Derbekê lêdane li Ûsivê Kor Husêñ Paşa
 Mehmed Begê, Tahar Begê, welle urt û
 ocaxa Kurda hatiye ber miratê,
 Hêsir im, hêsir im, hêsir im, hêsir im, hêsir
 im,
 Ez hêsir û feqirê Geliyê Zila me, hey bavo,
 hey bavo.

Wey salê, way salê, way salê, way salê, way
 salê,
 Lê lê anê dêranê, malê me muhacir bûne
 çardê vê Nisanê,
 Konê Ûsivê Kor Husêñ Paşa daniye li ber
 Sipanê bîniya vê Xelatê,
 Bîniya vê Xelatê, li serê vê duriyanê,
 Giran e hukumeta, dewletê bavê bavê eşira,
 Eşira lawê Taho bî aşt, ji talima helan danê,
 Heywax, heywax, heywax, heywax, heywax,
 Keseki xudani xêra nemaye cewabekê
 bisine Êyranê ji Memê ra
 Bibê lo, lo Memê te ocaxkoro were te
 dînyayê windayo
 Derbekê lêdane li Mehmed Begê, li Tahar
 Beg li Ûsivê Kor Husêñ Paşa
 Welle urt û ocaxa Kurda anine deriya malê,
 Hêsir, hêsir, hêsir, hêsir, hêsir
 Ez hêsir û feqirê Geliyê Zila me, hey bavo,
 hey bavo,
 Ez dîmirim, herçar malê muhaciriyyê,
 Welle heyfa min tê li qiz û bûkê çiyayê Ser-
 hedê,
 Ku ketine destê çiprût û pêxwasê vê beriyê,
 Hêsir im, hêsir im, hêsir im, hêsir im anê.


Way salê, way salê, way salê, way salê, way
 salê
 Lê, lê anê dêranê ez nizanîm şerê çardê
 sibatê
 Dî Geliyê Zila da ki û ki kir,
 Mehmed Begê, Tahar Beg, Ûsivê Kor Husêñ
 Paşa
 Sedemê gustilê zêrin, herçar pêçiyê wan bî
 qemê jêkir,
 Hêsir im, hêsir im, hêsir im, hêsir im, hêsir
 im
 Ez hêsir û feqirê Geliyê Zila me, hey bavo,
 hey bavo.

(Dewam dîke)



QUNCIKÊ ZAROKAN

BL FABL FABL FABL FABL FABL FABL FABL FABL FA



Kêwrûşk û kûsi

Kêwrûşkê tînazê xwe bî kûsi dîkîr, çıma ku kûsi wîsa hêdi dîmeşıya.

- Were ez û tu bikevin pêşbirkê, kêwrûşkê got, ka ki jî me zûtir dîbeze?

Kûsi got:

- Haydê em bazdin!

Pêşbirkê dest pê kîr. Kûsi lî paş ma. Kêwrûşk geleki dûr çû û sekini. Wi got: "EZ dê nîha jî xwe ra hîneki bîçêrim, kulopaniyan vedim. Hemin wextê mîn pîr heye."


Lê pîsti demekê kêwrûşk wesiya, û çavê xwe lî ciheki siyi gerand. Çû dî bin siya dareki da veleziya - û dî xew ra çû.

Dî vê navberê da kûsi ji geleki rê çûbû. Hêdi dîmeşıya, lêbelê

hiç nedîsekini û bîhna xwe nedîstand. Û dema kêwrûşk jî xew rabû, wi qet ser û beratê kûsi li wan deran nedit. Loma rabû û heta jê hat zû berbî hocikê bazda. Wi pîr lezand, lê dema xwe gîhande ber hocikê, dit ku kûsi beri wi xwe gîhandiye hocikê. Kûsi lî wîr sekînibû, lî kêwrûşkê dînihêri û wîsa tiq-tiq pê dikeniya, mîrov dîgot qey wê jî qalîkê xwe yê stûr bikeve ser erdê.

Kûsiyeki ku hêdi bî rê va dîce dikare jî kêwrûşkeki rawestiyayı zûtir xwe bigihine arman-cê.

Fabl ji Aisopos



Şêr û müşk

Rojekê dema şerek veleziyabû û radîza, müşkeki piçûk hat dî ser pozê wi ra derbas bû û ew ji xewa şirin şiyar kır. Şêrê vecinîqi bî hêrs müşk kırt û kır ku wi bixwe. Lê müşk lava kır û got:

- Mîn nexwe, berde ez lî riya xwe herim. Dîbe ku rojek bê ez ji bî te ra qenciyekê bikim.
- Erê lê, xwezi mîn ew roj bîdita ka piçîlokeki mina te wê bikaribe çi qenciyê bî mîn ra bîke! Lê disan ji ez te aza dikim, haydê lêxe here işê xwe!

Lehzekê paşê şêr kete keminekê

û çend nêcirvanan şêr girtin. Ew bî darekê va girêdan û çûn malê ku çekekê binin û pê wi bikujin. Şêr gumana xwe ji jiyanê bîribû. Wi welê bawer dikir ku êdi dawiya wi hat. Lê müşk axin û nalina şêr bîhist û hankava bazda çû hawariya şêr. Müskê piçûk bî dîdanên xwe yên tûj weris kot û şêr ji darê filiti.

- İcar te dit, müşk got, tu bî mîn kenyayî wexta ku mîn soz da te ku ez dê rojekê bî te ra qenciyekê bikim. Lê niha tu dîbini, ku müşkek ji dikare bî şêreki ra qenciyê bîke.

Fabl ji Aisopos

DERANİN

B. ZINAR

Meşk jî postê bızına
Çêrya bû lı terezîna
Şirê wê biçûka xwar
Rûnê wê para mezîna.

Mirzeydinê mîn şêr e
Jî mîrov wetrê ew têr e
Çardeh nana dihêre
Hê jî kebaniyê newêre.

Milan tê jî leterê
Hate bînê bêderê
Dê çû pez bîdoşe
Bav çû ka bîde kerê.

Mîrişka me bî hêk e
Hêk jî andêrê dik e
Kes tune hêkerûnê çê ke
Pê mîvana bî rê ke.

Navê kebaniyê Almast
Da mîvana çeqilmast
Fîraq dane ber deri
Kûçîka dîza wê alast.

Navê lawîkê mîn Eli
Lê kîr şili-şepeli
Jî xelkê ra tal û tîrş
Jî mîn ra dîms-qeli.

Pezê me hate dana
Şir tiji bû guhana
Em gelek pê kîfxweş bûn
Rehme lî bavê şivanan.

Sûretsor, enideqê
Pozpijinê findeqê
Kurk jî postê werşeqê
Lawîka kîre meraqê.

Şêxek hat jî diwala
Xwe berda nava mala
Berev kîr ar û rûn
Nehîst xwarîna pala.

Tavê daye diwara
Maye karê xewara
Çelek mane bê dotin
Xwêş bû dîlê neyara.

Vi Ferati leme leme
Ez heyrana dengê te me
Dîçe heta Derya Hindê
Ku da heri ez lî dû te me.

Welatê me Mêrdin e
Temam keç û zeri ne
Çîçkê zeryê bîrin e
Devê mîn diîşine.

Ha jor da baran bê yo
Av da bînê holê yo
Şilan revi ber deri
Hewar da nava êlê yo.

Zendê sıpi bî bazin
Devê biçûk ne mezîn
Par qiz bû isal bû jîn
Bû kebaniya mala mîn.

BEREVOKA TERMAN

NAVÊN HIN GUL Û KULILKAN



BINEVS violet



GEZIZE (fincanok)
blue-bell



ADAROK
blue anemone



GULBIHAR
primrose



NİLÜFER
water-lily



SÊBELGO (tarigan)
clover



ŞILAN
dog-rose



PIRPIZÊQ crocus



PÊCANIK coltsfoot



TÈLİ (kulilkzer, xilinzer) dandelion




GUL rose



SOSIN iris




NÊRGİZ narcissus, daffodil



GULQERENFİL (mexik) carnation




NİSANOK anemone




KERBEŞ sea holly




GL. BERBIRO (gulberoj) Sun flower




GULALE tulip



XAŞXAŞK (xecxecok) poppy



GULÇIÇEK marigold



STÊRKGUL aster



BEYBÛN (beybinok) camomile